


Ev pêvajoyeke nû ye. Serkaniya gişfî dixwaze vê mijarê bide nîqaşkirin. Lê divê mirov jî vê pêvajoyê ew qas hêvîdar nebe." Buldan balê dikşîne ser nasnameya kurd ku vê carê leşker jî qebûl dikin. Ew dide zanîn ku leşker jî êdî westiyane, jî hin nirxên xwe dûr ketine. Ji ber vê yekê pêşeroja wan baş nayê xuyan, lewre jî ew dixwazin vê pirsgirêkê çareser bikin. Li aliyê din Buldan balê dikşîne ser gotineke leşkeran û wiha dibêje: "Leşker dibêjin 'teror hatiye asteke nizim, lê çareserîya siyasî nebe wê xebata me di avê de here' bi vê yekê ve girêdayî ew jî didine zanîn ku bawerîya wan bi siyasethanên wan nîn e. Leşker jî êdî dizanin ku çekdarên kurd bi kuştinê xelas nabîn, jî ber vê yekê mecbûr mane ku nasnameya kurdan bipejirînin."

Rûpel-3



Endamê Konseya Rêveber a PKDW'ê Nejdet Buldan:

ANES westiyaye

Lêpirsîn:

Êrişên li ser çanda kurdî
durûtiya dewletê ye

Rûpel 8-9

Mebûsên Rûsî:

Rûsya dikare mesela
kurdan bîne rojeva NY'ê


Rûpel 4-5

Çalaki:

Şevbuhêrka
wêjeya kurdî

Rûpel-10

Azadiya WELAT



SAMI TAN

Mirov heyberekî rêkxistî ye

Dema mirov bala xwe didê, tê dîtîn ku gelek mirovên ku li ser navê welatparêziyê kar dikin, bi rewşa xwe qayil in. Em kî ne, ji ku ne, ji bo çi hatine, bi ku ve diçin, bersiva van pirsan di serê me de ne zelal e. Bi kurtasî em xwe nas nakin, ketine ber "bayê felekê" ew me bi ku ve bajo, em bi wir de diçin. Em fêhm nakin ku ew "bayê felekê" bîrdoza dijmin e.

Mirovahiyê digel berberiya bi surîştê re, bi xwe re jî kete berberiyekê, her tim telesiya xwe kiriye, her ku li hemberî surîştê bi ser ketiye, xwe zêdetir nas kiriye, bi hêza şiyana xwe hesiye. Ji ber vê yekê Engels, wekî hêmaneke bingehîn a perîsîna mirovahiyê, çêlî emeg û wekî amûra bingehîn a ber afirandinê jî çêlî destê mirov kiriye.

Têkiliyê diyalektîk û pîralî di navbera mêtî û dest, surîşt û dest, surîşt û mêtî de heye. Mirov parçeyekî surîştê ye û raman madeya di asta herî bilind a perîsînê de ye. Lê raman bi serê xwe bi

kêrî tiştêkî nayê. Dema ew rê nîşanî mirovan nede, nikare bibe hêzeke guherîner. Li aliyê din mirov bi serê xwe nikarin tiştêkî bikin, pêdiviya wan bi hev heye, ji ber ku mirov heyberên civakî ne, nikarin bêyî hev bijîn. Lewre jî mêtî ve wan karê hilberînê tev kirin. Mirov dikare peyva "civakîbûnê" wekî "rêkxistîbûnê" jî şîrove bike. Raman dema rê nîşanî mirovê rêkxistî bide, dibe hêzeke guherîner. Bi vê yekê daxwazên mirovan tên cih.

Mirovahiyê her ku xwe baştir nas kiriye, civaka xwe jî li gorî hewcedariyên xwe têkûztir kiriye. Lê çi wexta ku di nava mirovahiyê de dubendiyê dest pê kiriye, ango çinayeti derketiye holê, digel berberiya bi surîştê re, şerê çinayeti jî dest pê kiriye. Lewre jî rêxistina civakî jî çinên bindest durt ketiye, bûye çek di destê çinên serdest. Li hemberî rewşê çinên bindest rêxistinên dijber ava kirine û li hemberî çinên çewşîner serî hildane.

Gelê kurd jî ji roja ku xwe naskiriye, heta îro rêxistin ava kirine. Piştî ku hêzên dagirker welatê wan dagir kirine, wan jî rêxistinên rizgariyê yên bi rengên cur bi cur saz kirine û şerê dijminên xwe kirine. Hin caran bi ser ketine û zora neyarên xwe birine, hin caran jî têk çûne. Her çiqas gelê kurd wekî gel bindest be jî, di nava civaka kurd de jî çinên cur bi cur hene û li gorî vê yekê jî rêxistinên cuda avabûne, wan rêxistinên li gorî zanîna û karîna xwe serî hildane, hinek serkeftin bi dest xistine, lê di dawiyê de têk çûne.

Heta ku benda karkerên kurd derketiye ser qada dîrokê. Di dawiya salên 1970'yî de bîrek ciwanên kurd ên bijarte, bîrdoza sosyalîzma zanistî ango bîrdoza karkerên Kurdistanê jî xwe re kirine rênîşandar li deşta Fîsê çeka herî bikêr a ku çarenûsa gelê kurd biguherîne afirandine. Ev mêtî bûye gava yekemîn a rêpîvana azadiyê ya gelê Kurdistanê.

Bi kurtasî em xwe nas nakin, ketine ber "bayê felekê" ew me bi ku ve bajo, em bi wir de diçin. Em fêhm nakin ku ew "bayê felekê" bîrdoza dijmin e.

Riya xweparastinê û serokatî

Ferhengok

- | | |
|--|--|
| aramî: istîqrar, hizûr | nasnav: huyiyet |
| alandin: pêçandin, (sarmak) | navberkar: qasid, elçî |
| babet: mijar, mewzû | nêremo: nêremûçk (eşcinsel) |
| berxwedêr: têkoşer (direnîşçi) | nepêkan: negengaz, nênimkûn |
| berberî: dijayeti, hevriki | nêrevan: çavdêr(gözlem) |
| bêgavî: mecburiyêt | nijdarî: bijûndarî, sihat |
| bişîrîn: besimîn (gülümseme) | nisilandin: dapalandin, dakirin (süzme) |
| biluşt: cennet | nivîstî: raketî, razayî |
| cerdkirin: avêtin, ser (baskin) | perîsîn: kemilîn |
| çarenûs: qeder | perestgeh: îbadetxane |
| çeçîn: terq lê ketin | pest: pêkûtî |
| çewşîner: zordestî | pêngav: gav |
| çêlîkirin: behskirin | qima navîn: dema navîn |
| çêjandin: tamkirin | ramîn: fikirîn, hizirîn |
| derbirin: ifadekirin | rasteqîn: rastîn |
| destnîşankirin: tespîtkirin | rexnegir: rexnevan |
| fêrkirin: hînkirin, | rêpîvan: meş, rêveçûn |
| gefneende: rêveber | sarkar: buzdolabî |
| girîbûn: veciniqîn | sazûmankar: avakar |
| guherîner: guherînkar | seratayî: pêşî |
| heyber: gîyanewer (canî) | serdan: ziyaret |
| hilberîn: îretim | şewir: jêpîrsîn (danuşma) |
| hincandin: heşandin | sinarîn: rexnekirin |
| hingazandin: rêzandin | taybetmendî: ozellik |
| jêbirin: jêgirtin | têkşikandin: têkbirin |
| katjimê: kate | tûşhatin: lêrasthatin |
| keçe: rûn | welam: bersiv |
| kotan: gîrîkî, ne zelal | xal: madde, niqte |
| meçetî: meçet | xeterê: talûke |
| mengî: meçet | xumam: girikî, ne zelal |
| | zagon: qanûn |

MUHAMMED MUHAMMED

Gelê kurd bi baweriyê xurt nêzikî vatîniya xwe dibe. Hemû riya xwe hêsan dike. Ji ber ku xwe di nav felsefeya partiye de dide helandin. Naskirina gel bi riya felsefeya serokatîyê, naskirina welat û parastina mirovahiyê ye. Yekbûna gel jî dihêle ku ev felsefe ji xwe re cihekî taybet û bi rûmet di nav civak û malbata mirovahiyê de bigire. Gelê kurd xwe bi yekitiyê xurt li Fîsê da parastin.

Ev parastina rast, bingeha xwe ji raman û bîrdoziya zanistî distîne. Bîrdozî, eşq û moralê dide mirovan. Mirov jî bi hemû azwêr (tutku) û dilînen xwe bi welatê xwe ve tên girêdan. Hezkirina mezin ji netewetiyê re, parastineke têkûz, ji bo gihîştina armancê ava dike. Lewre tiştên ku jê tê hezkirin, mirov ji bo wê hemû derfet û enerjîya xwe dike cango. Çeka herî xurt ji bo parastina berhem û nîrxên mirovahiyê, naskirina bîrdoziyê ye. Serokê Neteweyî, bi bîrdoziya zanistî her çar perçeyên welat, heyanî şanekên biçûk gav bi gav dike yek. Ev jî, ji destpêka sedsala bîst û yekan re parastina dîrok, xweza û rihê mirovahiyê ye. Ev parastina ku serokatîyê daye avakirin, tu hêz nema karîna bidin erdê. Êdî, gelê me bi zewq û bi heyecanekî bilind, hemû nîrxên xwe yê neteweyî diparêze. Bi vê parastinê ra avakirina artêşa neteweyî, çalakîyên dip-

lomasî mirovên zana, afirandine. Rêxistinên ku bi van berjewendiyên xwe yê demkî û demdirêj misoger kirine, di cihana nûjen de, dibe xwedî gotin û biryar.

Beriya partiye jî, gelê me xwe bi çekan parastibû. Lê ew parastineke biçûk a ji bo êl û pîreka xwe bû. Ji ber ku ne serokatî, ne rêxistin, ne yekbûn û ne jî zanebûn hebû, nikaribûn xwe baş biparêze. Yanê bê plan û tevdir radihiştin çekan û bi çiyana diketin. Ji ber van sedeman jî tu

Sedema lipaşneketina partiye ev e ku têkoşîna gelê me her roj xwe nû dike û bi nûkirinê re hemû nexweşiyên dagirkeran di kesayetîya xwe de dide mehkûmkirin.

encam negirtin. Dilê wan bi heskirina welat û bi jiyaneke azad nehatibû dagirtin. Lê îro gel, ew nezani li paş xwe hiştiye. Li ser ramanên partiye xwe gihandine kesayetiyê hemdem. Bi xebata xwe re-ş û sipî, ter û hişk ji hev cuda kirine. Dizane wê çawa li hemberî neyar û tiştên şaş xwe biparêze.

Gihîştina gelê me ya vê asta bilind ji hemû hêlan va didome. Lewre gel baş dizane ku parastin, ne tenê li hemberî hêzên biyan e, divê mirovan bi milyonan têxe artêşê û xwe bi çek û teknîkên nûjenî bipêçe. Ji vê yekê bêhtir parastina rêkxistî û yekbûna ri-

hê neteweyî li hemberî hemû nexweşiyên dijmin û împeryalizmê pêwîst e. Parastina mirovan ji nexweşî û wêrana kedxwaran, bilindbûna rihê mirov e. Mezinbûn û dewlemendiya rih, riya avakirina lehengên mezin e. Mirovên leheng û qehreman jî herdem, ramanên civakê nûjen dike û bi mejiyê xwe civakê û hemû gewşînen mirovahiyê diparêze.

Bêguman artêş jî ji bo parastinê rîstekî girîng dilîze û hem jî pêwîst e. Lê divê mirov her tiştê xwe bi artêşê ve girê nede. Ji ber ku dawîya xwe hedimandine. Wekî mînak, sosyalîzma reel xwediyê pênc milyon leşker bû. Lê dawiyê bê encam ma. Lewre wê guh neda karê parastina bîrdoziyê û nûkirina ramanan.

Çima hemû dewletên reel sosyalist û tevgerên çîn bi paş ketin, tenê PKK li paş neket? Sedema vê yekê ev e ku têkoşîna gelê me her roj xwe nû dike. Bi nûkirinê re hemû nexweşiyên dagirkeran di kesayetîya xwe de dide mehkûmkirin. Bi hînbûna felsefê û konevaniya partiye, mirovên nû ava dike. Mirovên nû jî xwe ji hemû gewşîna û êrişên kemalîzmê û împeryaliztan rizgar dike.

Ev jî bi xwe vemirandina hêviya wan e. Vemirandina hêviyê, mirin bi xwe ye. Ji ber wê sedemê Emerîka dibêje: "Di cihanê de PKK partiya herî bi talûke ye."

Ew jî dibînin ku serokê neteweyî riya parastinê nîşanî PKK'ê wê jî rê nîşanî gelê kurd da, gelê kurd jî rê nîşanî gel û çinên bindest dide.

Endamê Konseya Rêveber a PKDW'ê Nejdet Buldan: Artêş westiyaye

Serkaniya Giştî di meşandina şerê qirêj de alîkariyeke mezin û yekser ji çapemeniya xwe werdigire. Niha jî dixwazin di çareseriyê ve pirsgirêkê de çapemeniyê bi kar bînin. Ev pêvajoyeke nû ye serkaniya giştî dixwaze ve mijarê bide nîqaşkirin. Lê divê mirov ji ve pêvajoyê ew qas hêvîdar nebe.

Gera ku Serkaniya Giştî ya Tirkîyeyê ji bo hin rojnamevanan saz kiribû, ev du hefte ne ku li ser pirsê legal û gotûbêj tene kirin. Li aliyê nermbûna helwesta artêşa tirk tê nîqaşkirin, li aliyê din ev ger hin pirsên ku têkiliyên di navbera sermayedaran û leşkeran de anîn rojevê. Li gorî hin çavkaniyan ev ger ji aliyê hin sermayedaran ve hatiye saz kirin, lêçûna ve gerê jî 200 milyar bûye, ev pere ji aliyê wan ve hatiye dayin. Bi awayê ku derdorên navborî dibêjin, leşkeran ji bo ku mesajê erênî bidin Yekîtiya Ewropayê da ku ew Tirkîyeyê mîna berendam bipejirîne, ew ger saz kirine. Lewre dê di 12'ê berfanbarê de li Lûksemburgê civînek pêk were û di ve civîne de dê berendamên Yekîtiya Ewropayê ben destnîşankirin. Bi heman mebestê, bi taybetî rojnamevanên çepgir hatine nêqandin.

Artêş ji hin nîrxên xwe dûr ketiye

Li gorî îdiayeke din, ev du sal in ku Amerîkayê ambargoyeke veşarî ya çekan daniye ser Tirkîyeyê, du keştiyên şer ên ku Tirkîyeyê kirine jî, nade. Wekî sedema ve ambargoyê jî helwesta Tirkîyeyê di politikaya Kibrisê de, hem jî çareserkerina pirsgirêka kurdî tê bilêvkirin. Generalên tirk berî ku Cîgirê Serkanê Giştî Çevik Bir bişînin Amerîkayê xwestin mesajê nerm bidin vî welaatî.

Her wiha li gorî ku ew rojnamevanên çûne gerê, dinvîsînîna Serkaniya Giştî ya Tirkîyeyê çareseriyê beryî PKK'ê aniye rojevê û cara yekemîn jî pirsgirêka kurdî bi lêv kiriye. Li ser van esasan me dîtîna ramanên PKDW'ê, HADEP û İsmail Nacar standin.

Endamê Konseya Rêveber a PKDW'ê Nejdet Buldan ve gerê wekî bûyereke nû dinirxîne û dadixuyine ku berê jî çapemenî diçû herêmê, lê wê demê nêzîktêdayîna çapemeniyê li ser xîmê propagandaya kemalîzmê û nijadperestiyê bû, her çiqas jî ve gera dawî jî bêhna militarîzmê bê, hinek cudatî balê dikişînin. Buldan ve yekê wiha şîrove dike: "Serkaniya Giştî di meşandina şerê qirêj de alîkariyeke mezin û yekser ji çapemeniya xwe werdigire. Niha jî dixwazin di çareseriyê ve pirsgirêkê de ji çapemeniyê bi kar bînin. Ev pêvajoyeke nû ye serkaniya giştî dixwaze ve mijarê bide nîqaşkirin. Lê divê mirov ji ve pêvajoyê ew qas hêvîdar nebe." Buldan balê dikişîne. Ser nasnameya kurd ku ve carê leşker jî qebûl dikin. Ew dide zanîn ku leşker jî êdî westiyane, ji hin nîrxên xwe dûr ketine. Ji ber ve yekê pêşeroja wan baş nayê xuyan, lewre jî ew dixwazin ve pirsgirêkê çareser bikin. Li aliyê din Bul-

dan bal dikişîne ser gotineke leşkeran û wiha dibêje: "Leşker dibêjin 'teror hatiye asteke nizim, lê çareseriyê siyasî nebe wê xebata me di avê de here' bi ve yekê ve girêdayî ew jî didine zanîn ku baweriyê wan bi siyasethanên wan nîn e. Leşker jî êdî dizanin ku çekdarên kurd bi kuştinê xelas nabin, ji ber ve yekê mecbûr mane ku nasnameya kurdan bipejirînin."


Li ser pirsê me ya 'Serkaniya giştî çima bangî rojnamegerên kurd nekir' jî Nejdet Buldan dide zanîn ku dewlet bi tu awayî naxwaze bi kesên, sazî û rêxistinan re li ser çareseriyê bê axaftin, ew dixwaze çareseriyê di nava sistema heyî de bibîne. Buldan wiha dibêje: "Dewleta tirk jî dizane kurd bi kê tene naskirin. Kî şer dike? Helbet dewletê çareseriyê bi ceş, kurdên hevalbendên wê û kurdên ji bo wê baş re bibîne her rê ceriband. Lê dewlet jî dizane ew ne alî ne." Buldan mijara nebîrîna rojnamevanên kurd jî wiha şîrove dike "Di vî şerî de helwesta dewleta tirk li hemberî şervan çî be, li hemberî rojnamevan û siyastevanên kurd jî ew e."

Buldan li ser plana jî bo çareserkerina pirsgirêka kurdî jî da zanîn ku hê dewleta tirk ne zelal e, planên wan ên jî bo çareseriyê hene. Lê dewlet jî ber ku hê ji aliyê leşkerî ve tê rêvebirin û di 70 saliya komarê de hê jî qetîaman li ser gelên wekî asûrî, rûm, ermen û kurdan dimeşîne, sedema ve yekê awayê perwerdekirinê û bîrdoza kemalîzmê ye.

Bêyî PKK'ê çareserî nabe

Li ser heman mijarê İsmail Nacar dide zanîn ku ev gaveke erênî ye. Lê divê bi ve yekê nemîne, Nacar axaftina xwe wiha didomîne: "Her kesê ku ji xwe re dibêje; 'ez rawşenbîr im, ez kurd im, ez tirk im' çî dibe bila bibe, divê dest biavêje vî karî, bi salan e ku li herêmê xwîn dirije, merhaleya ku îro em hatine nîşan dide ku divê ew pirsgirêkê bê çareserkerin. Ji bo çareserkerinê jî divê mîjîyê mirovan li ser ve mijarê zelal be û rasyonalist be, realist be ku bikaribe li pirsgirêkê objektîf binihêre. Dema ku wisa nebe, wê gavê çareseriyê pirsgirêkê jî nabe, wê dîsa pirsgirêkê bi vî rengî rû bidin."

Nacar diyar dike ku ew hê jî li ser çareseriyê pirsgirêkê dixebite, piştî ku RP hatiye ser kar Erbakan gazî wî kiriye, jê pirojeyê berfireh xwestiye, wî jî projeyê berfireh pêşkêşî Serokê RP'yê û Serokwezîrê berê Necmettin Erbakan kiriye, ji ber hin endîşeyên xwe, nêzîkî projeya wî nebûne. Her wiha İsmail Nacar jî bo çareseriyê domdar dide zanîn ku divê PKK jî di nav projeya aştiyê de be û-wiha



Murat Bozlak



dibêje: "Min berê jî bi birêz Öcalan re bi riya telefonê xeber dabû, min ev dîtinên xwe ji wî re jî gotin. Li gorî min jî bo çareseriyê pirsgirêkê aliyan şer kî bin, divê di nav çerçoweyê zanîstî de ve pirsgirêkê çareser bikin. Min ev dîtinên xwe ji çapemeniya tirk re jî diyar kirin."

Nacar li ser lawaziyên sistemê û raweşenbîran jî rawestiya. Li gorî Nacar di-viyabû ev pirsgirêkê jî aliyê raweşenbîran ve bi projeyên berfireh bihata çareserkerin. Nacar nebûna raweşenbîran wisa, wekî kêmasiya raweşenbîran kurd û tirk destnîşan kir. Nacar diyar kir ku kêmasiyê sistemê hem li gelê tirk hem jî li gelê kurd bûye bar, divê ew rojek pêş de ji holê bê rakirin.

Serokê Giştî yê HADEP'ê Murat Bozlak jî li ser ve mijarê da zanîn ku berê jî gerên bi vî rengî hatine saz kirin. Lê cudahiya ve gerê rojnamegerên ku birin navên wan ji yê din cihê bûne. Bozlak diyar dike ku birina hin rojnamevanên qasê çepgir û di quncikê xwe de li ser pirsgirêka kurdî dinvîsînîna pêşveçûneke erênî ye.

Li ser pirsê me ya bi rengê, "Gelo ji bo ku Tirkîye bikeve Yekîtiya Ewropayê (YE), ev jî ne listikeke serkaniya giştî ye?", Bozlak wiha axivî: "Pirsgirêka kurdî li Tirkîyeyê hem pirsgirêka herî binge-hîn û mezin e, hem jî pirsgirêka kurd û tirk e, listik pirsgirêkê çareser nake. Ew-rûpa jî bo çareseriyê pirsgirêkê hin reaksiyonan nîşan dide, lê li gorî ku artêş dixwaze êdî pirsgirêkê bê nîqaşkirin li gorî me, ev bi giştî êdî jî bo çareseriyê pêşveçûneke erênî ye. Lê divê bi ve nemîne, êdî pirsgirêkê bê çareserkerin."

M. AKSOY

Kurtenûçe

Êrişî li ser HADEP'ê

Di 23'ê sermawezê 1997'an de ji bo "civîna herêmê" Serokê Giştî yê HADEP'ê Murat Bozlak û 12 rêveberên partiyê çûn Sêrtê. Lê hêzên dewletê nehiştin ku endamên partiyê beşdarî civîne bibin. Avahiya HADEP'ê hate dorpeçkirin. Her wiha erebeyên ku xwestin Bozlak û rêveberên HA-DEP'ê ji balafirgehê bigirin, ji bilî erebeyekê hatin desteser kirin. Rayedarên HADEP'ê ji aliyê hezar kesî ve hatin pêşwazî kirin.

Serdana Leyla Zana

Endamên Konseya Parlemantêrên Meclîsa Ewropayê û rapor-torên Tirkîyê Andras Barsony û Walter Schevimmer, çûn serdana parlamentera kurd Leyla Zana. Hevdiştin ji çapemeniyê re girtî bû. Li gorî daxuyaniyan, hevdiştin bi danûstandina bîr û baweriyên li ser bînpêkirina mafên mirovan derbas bû. Wekî tê zanîn parlemantêrên ewrûpî, girtîna parlemantêrên kurd, bi tundî rexne dikin û berdana wan ji rayedarên dewleta tirk dixwazin. ser rayedarên tirk.

TV'ya bi kurdî

Di parlamentoya Tirkîyeyê de vekirina televizyoneke kurdî hat nîqaşkirin. Li gorî agahiyan, mebusê CHP'ê Algan Hacaloğlu pêwîstiya televizyoneke bi kurdî anî zimên. Lê parlemantêrê DSP'ê Çetin Bilgin ev yek wekî sedema xurtbûna hestên cudaxwaziyê nîrxand û li dijî sekini. Ji aliyê din ve nivîskarê Radikalê İsmet Berkan di nivîsa xwe ya roja 27'ê sermawezê de dide diyarkirin ku, di encama lêkolîneke ji aliyê leşkeran ve hatiye kirin de, ji sedî çilê cerdevanan jî perwerdehiya bi kurdî dixwazin.

Kemîna gerîla

Li Çiyayê Çiravê leşkerên ku ji operasyonê vedigeriyên ketin kemîna gerîlayên ARGK'ê. Li gorî agahiyan, di vî şerî de heşt leşker hatine kuştin. Wekî tê zanîn hêzên dewletê li herêma Çiravê derûdora gundên Memiran operasyon dimeşandin, lê ji ber êriş û kemînan gerîlayan nîkaribûn zêde bi pêş de herin, lewre jî dawî li operasyona xwe anibûn, bi şûn ve vedigeriyên. Her wiha hate daxuyandin ku hêzên ARGK'ê bê xesar bi şûn ve vekîşiyane. Her wiha jî "bilî ve livbaziyê gerîlayan li gelek cihên din jî çalakiyên mîna êriş, kemîn, sabotaja li dijî xeta neftê û rêbirîna pêk anîn.

Rûsya dikare mesela kurdan bîne rojeva NY'ê

Emerîka çawa vî mafî bi xwe re dibîne ku rêxistineke wiha mezin û gelêrî wekî terorîst bi nav dike? Divê Washington jî têkeve nav vê lîsteya terorîstan; bomba atomê diavêjin Japonyayê, milletê Koreyê û Wîetnamê çend salan êrîşên Emerîkayê li ser xwe hîs kirin. Çima ew ne di serê vê lîsteyê de be? Kê ew maf daye Washingtonê ku qedera milletan ew binivisîne?



Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan

Piştî ku demek di ser hilweşîna sîstema Sovyetê re derbas bû, Rûsya ji nû ve bi ser xwe ve hat, xwest rola xwe di siyaseta cîhanê de bilfîze. Wekî gava yekemîn jî bala xwe da Rojhilata Navîn. Çalakiyên dewleta tirk ên li Asyaya Navîn û Azerbaycanê jî bûn sedem ku Rûsya têkiliyên xwe bi kurdan re xurtir bike. Her wiha tevgera azadiyê her wekî kurdên li seranserê cîhanê kurdên vê derê jî girtin bin bandora xwe. Lewre çalakiyên dîplomatîk di navbera PKK û dewleta rûsî de dest pê kirin. Di wêne de Komêk kurd Qada Lenîn tîn dîtin.

Rûsya ku piştî hilweşîna sîstema Sovyetê ketibû nav bêdengiyekê, hêdî hêdî bi ser hişê xwe ve tê û giraniya xwe dîsa datîne ser polîtîkayên ku xwe têkildar dibîne. Ji van polîtîkayan yek jî, bêguman problema kurdan e. Rûsya ku naxwaze li derveyî rojeva Rojhilata Navîn bimîne, lewre jî hê vekirîtir helwesta xwe der barê kurdan û PKK'ê de diyar dike. Berî niha bi demê Serokê Komîsyona Jeopolîtîkê ya Dûma ya Rûsya û nûnerên sê partiyên mezin; Partiya Komunîst, Partiya Lîberalan û Partiya Cotkaran çûbûn serdana Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan û di vegêra xwe de di nava çend rojan de hem civîna çapemeniyê çêkirin, hem jî pînelek li ser pîrsa kurdî li Dûmayê Rûsyayê li dar xistin. Em jî, ji vê panelê bi kurtî ji axaftinên beşdarên çend pasajan pêşkêşî we dikin.

Serokê Komîsyona Jeopolîtîkê yê Dûmayê Rûsyayê A. V. Mîtrofanov:

– Armanca vê ziyaretê, li ser çareserkirina problemên Rojhilata Navîn, Rojava û Asyaya Navîn fêhmkirina fikrên Serokê PKK'ê bû.

Lazim e ku em tiştekî vekirî bibêjin, di gelek pîrsan de, çi yên polîtîk û çi yên je-

opolîtîk fikrên me nêzikî hev bûn û gelek nêrînên me wekî hev bûn.

Piştî sala 1917'an ji hêla serokatiya Sovyeta Berê ya wê demê ve, Kemal Atatürk wekî sosyalîstekî yan jî komûnîstekî tirk hate dîtin.

Lê wê demê, Sovyetê dikaribû Tirkîye tune bikira, belê wekî em dibîn, Rûsyaya Sovyetê, alîkarî da dewleta tirkan û ew ava kir! Ev şaşîtiya herî mezin bû. Piştî van tiştan, Tirkîye şeş dewletên tirkan li ser axa Sovyetê ava kirin. Em bi Serokatiya PKK'ê re, li ser van rojên dîrokî rawestiyayî û A. Öcalan rexneyên tûj li dewleta Rûsyayê girtin. Öcalan wiha got: "Bi alîkariya Rûsyayê dewleta tirkan ava bû". Di destpêkê de Tirkîyeyek tenê hebû, paşê şeş dewletên din di Sovyeta Berê de (pênc dewlet di Asyaya Navîn de û yek jî bi navê Azerbaycan ku li Qefqasyayê ye), ji xeynî van di nava Rûsyayê de, niha 4-5 komarên (respûblîk) tirkan hene! Û ji niha ve bi hereketên xwe, doza otonomiyê dikin. Destpêk otonomî... piştî vê otonomiyê, wê statûya dewletê bixwazin! Wê çaxê diyê Rûsya pênc dewletên din ji Tirkîyeyê re pêşkêş bike, tiştekî wisa dîrokê nedîtiye, alîkariya Rûsyayê ji bo Tirkîyeyê tiştekî fantastîk e.

Her wiha birêz Abdullah Öcalan got:

"Bi ser de ji hûn Tirkîyeyê finanse dikin, lewre bi milyonan rûs ji bo bazirganiyê diçin Tirkîyeyê."

A.V. Filatov (parlamentar):

– Birêz Abdullah Öcalan bi henekî ji me re got: "Heger kurd tunebûna wê çaxê lazîm bû ku Rûsyayê bi xwe kurd çêbikîrana! Heger ne ji ber şerê milletê kurd bûya, dê Rûsyayê wê deme dijminatîya Tirkîyeyê hîs bikira". Ez dibêjim nîrxandina A. Öcalan pir girîng e. Bi rastî jî ku ne ji ber şerê gelê kurd bûya, niha Tirkîyeyê herêma başûr xistibû bin destên xwe. Ez tevli pêşniyazên mebusên din dibim ku pêwîst e em têkiliyên xwe bi rêxistinên kurdan, bi Parlamentoya Kurdistanê ya li Derveyî Welat re kûr û fireh bikin. Ji ber ku ev problem ber bi sala 2000'î ve diçe û heger problema kurdî bê çareserkin, wê çaxê rewşa Rojhilata Navîn û Ewropayê bi tevayî wê bê guhartin. Niha pîrsa kurdan û Kurdistanê li Rojhilata Navîn 'kilîd e', çiqasî ev pîrs zû bê çareserkin, wê gavê pozîsyona Rûsyayê wê xurtir bibe. Ji bo wê lazîm e ku em, di çareserkirina pîrsa kurdî de bibin alîkar. Ev yek ne tenê problema gelê kurd e, her wisa jî problema Rûsyayê bi xwe ye.

S.S Mîtroxîn (parlamentar):

– Dema hevdtîne me nixandinên din kirin. Min ji alî xwe ve pirs dane A. Ocalan û bersiva rast ji wî bihîst. Di vê bersivê de, me fêhm kir ku yekemîn armanca serokatiya gelê kurd û mîletê kurd ev e ku bi dewleta tirk re li ser maseyê rûne û dest bi diyalogan bike. Em dizanin ev armanca hanê ji zû de dane pêş xwe û di dema hevdtîne de, me hîn bêhtir ev daxwaza kurdan dît. Bi rastî jî kurd li ser axa xwe aştîyê dixwazin.

Îro mîletê kurd di nav destê dewleta terorîst de maye, çima em dibêjin terorîst? Ji ber ku nêzîkbûna Tirkiyeyê bi kurdan re nêzîkbûna terorîstan e û pozîsyona gelê kurd, ez rast dibînim. Kurd şerê xwe yê heqiyê dikin, ji ber ku dixwazin nêzîkbûna sistema dewletê li hemberî xwe biguherînin. Di hereketên kurdan de ez tiştê ekstremîstî (tundraw) nabînim. Kurd, tu peymanên ku Neteweyên Yekbûyî danîne, xerab nakin. Mîletê kurd wekî hemû mîletên din, di jiyane de tiştên elementarî (bingehîn) dixwazin.

Piştî vegeerê me, ji aliyê hinek sazîyan ve ji bo me îftîra hatin kirin û gotin “Hûn bi kurdan re dikevin nav dîplomasiyên bilind û hûn nahêlin ku em tîkiliyan di navbera xwe û dewletên din de çêbikin.” Lê me pirs dane wan însanên ku van îftîrayan diavêjin ser me, me got: “Ji bo ku ev rewş were guhartin, we çî kiriyê?” Nikaribûn bersivê bidin. Ev çend sal in ev jenosîda (qirkirin) kurdan berdewam e, bi dehan salan e rêberên ewrûpiyan, Neteweyên

Yekbûyî û NATO, ma nikarin tiştê bikin ji bo çareserkirina pîrsa kurdan, nikarin şer bidin rawestandî û jenosîdê bidin sekinandin? Ma em ê dîsa bi deh salan rûnin, bêçare û bi nezaniyê temaşê bikin û nikaribin çareseriyê bibînin? Na! Dema em dibînin ew hêzên ku gerek e li çareseriyê bigerin tiştê nakin wê gavê em tîdigihêjin ku divê em li riyê û li çareseriyê bigerin. Armanca çûna me ev bû ku bi derfetên me yê heftî em bandorê li ser vê pîrsê çêbikin û belkî jî bibin alîkarê çareserkirinê. Ji bo min tiştê herî girîng ew e ku Serokatiya Gelê Kurd û mîletê kurd hedefê didin pêş xwe û li ser wê riyê dimeşin, ku bi riya aştîyê û diyalogan problema xwe çareser bikin. Ji bo min, mîletê kurd û tîkoşîna wan, ne terorîzm e û PKK wekî ku bêbextî lê dibe, rêxistineke ne eşqîya ye.

Daxwaziyên kurdan ez bi heq dibînim. Lê ev daxwaziya wan çawa ji aliyê dewleta tirk re, her wisa jî ji aliyê dewletên mezînan ku piştigiriya tirkan dikin ve, nayê dîtin û pejiandî. Helbet ev rewş divê were şikestin û dewletên ku di bloka NATO'yê de ne gerek e polîtîkaya xwe ya durûtiyê îftîraf bikin ku ev siyaseta wan di çareserkirina pîrsa kurdî de dibe asteng. Ji bo vê lazim e em bixebitin û ev xebat gereke bi ser bikeve! Ji aliyê din ve ez dibînim ku dewletên Ewrûpayê naxwazin li ser pîrsa kurdî rawestin û dixwazin ku xwe ji pîrsa kurdî dûr bixin. Ya din dewletên ewrûpî naxwazin li ser wî mîletê ku bi peyva terorîstiyê hatiye qirêjkirin, bipeyvin...

Y.V. Nikîforênko (parlamentar):

– Li piştî vê sistema kevîna li Tirkiyeyê dimeşe, siyaseta derve ya Emerîkiyan heye. Emerîka rê nade kurdan ku erdê xwe bistîne, çanda xwe pêş bixîne û xwe biparêze. Her wekî çawa ku mafê her mîletî heye ku azad be, mafê kurdan yê azadiyê jî heye. Mîletê kurd dixwaze serbixwe bîjî, lê ne bi gotina Washingtonê! Ji bilî vê, Emerîkayê listeya organizasyonên terorîstî derxistî ye. Emerîka çawa vî mafî bi xwe re dibîne ku rêxistineke wiha mezînan û gelê wî wekî terorîst binav bike? Divê Washington jî têkeve nav vê listeya terorîstan; bomba atomê diavêjin Japonyayê, mîletê Koreyê û Wîetnamê çend salan êrîşên Emerîkayê li ser xwe hîs kirin, ambargoya li ser Kûba, Iraq, Lîbyayê bi destê kê ye? Dîsa Emerîka ye... Çima ew ne di serê vê listeyê de be? Kê ew maf daye Washingtonê ku qedera mîletan ew binivîsîne?

Bibexşînin, belkî ez vê pîrsê pir hişk dibêjim, lê êdî ew henekên xwe bi me dikin! Niha jî hatine Rûsyayê û di guhê me de dixwînin.

Yek bi navê Soros tê vir, pirtûkan dinivîsîne, dîrokê çêdike û me fêr dike! Dibêje, “Wî wezîrê hanê bihêlin, yê din hildin...” Li her derê dixwazin serokatiyê bikin, jixwe li qurêtiya wan binêrin! Li aqilbendan binêrin, bê çî zane ne! Ji Ewrûpayê çûn çermor qetilkirin, ên mayî jî xistin bin destên xwe û dibêjin, “em dewleteke pêşkeftî ne...” Piştî xelasbûna festîvala ku kurdan li Yewnanîstanê li bajarê Selanîkê (19-21 'ê rezberê) li dar xistin, Tirkiye jî êrîşa xwe ya 2'yemîn li dijî kurdan di Kurdîstana

Başûr de da nişan da. Dîroka sê hezar salan a kurdan ji bo gelekî nimûne ye. Kurd mîletekî parçekirî û belavkirî ye, lê enerjîyeke mezînan ya parastina mafên xwe bi wan re heye. Azadiya xwe heya dawiyê dixwazin. Dewleta tirk Kurdan mecbûr dike ku ew bi şer parastina xwe bikin. Îro li Tirkiyeyê mixabin nahêlin ku kurd bi kurdî biaxivin, xwe wekî kurd bibînin, ma ev demokrasî ye, ev azadî ye? Na... Emerîka ji bo jenosîda ku Tirkiye li ser kurdan dimeşîne ne ku bi tenê dengê xwe nake, bi ser de jî Tirkiyeyê xelat dike. Ji ber vê yekê dema Wezaretê Rûsyayê ya Karê Derve, hikûmeta me û Serokê me yê “kal” ji bo parastina gelê kurd gava xwe neavêje ez pir diêsim.

Li ber Tirkiyeyê derfeteke aştîyê heye, yan na dê pêşeroja wan jî tarî be.

Helbet Rûsyayê divê pîrsa kurdî bide pêşîya Neteweyên Yekbûyî.

Hevdtîna me, ne bêfêde bû. Lazim e hevdtîna, kontakt û diyalogan bi vî rengî bêne xurtkirin. Ji ber ku bi riya diyalogan em hîn bêhtir dikarin nêzîkî probleman bibin û rewşê nas bikin. Her wiha em dikarin bandorê li ser pozîsyon û rêberîya Rûsyayê bikin.

Rûsyayê dikare du rolên mezînan di vê pîrsê de bilîze:


1- Rûsiya dikare di navbera kurdan û dewleta tirk re bibe navberkar.

2- Di pêşerojê de Rûsiya dikare pîrsê deyne pêşîya Neteweyên Yekbûyî. Mixabin kurd mîletekî bêdewlet e û çîhê xwe di Neteweyên Yekbûyî (NY) de nagire. Di pêşerojê de, vê rolê Rûsiya dikare hilde ser xwe.

AMADEKAR: REWŞENA BEDİR

Ambargo (2)

MEDENÎ FERHO



– Navê te çî ye Kirîvo?
– Mixo!...
– Rîxo navê bavê te çî ye?
– Te çî navê min kire lehî,
dora navê bavê min e.
(Çivanoka Gelerî)

O rînt, gotineke bi guman e. Mirov jî terefnegr nabe. Zanîstiya Oryantalîzm di sedsala 19'an de pişkiyî ye. Li xaka Erebanê û Anatoliya Osmanîyan di navîka 'reqqas' an de rûniştî ye. Li rojhilat ramangîriya tîr-tîkîlî û tevlihev e. O rînt, bi Champollîon, A. Duperon û W. Dones dest pê dike. Gelo li nav me kurdan di çî mane û wateyê de ye? (Mîna keşfûzuniya paşazadeyê kurd ku bi keşeyê mîsyoner re berbûtiyê bike û şewirmendiya serdarekî kurd bike.)

Di sedsala XIV'an de ku navê xwe nabêje û zanîstiya sosyolojî li dar dixê, lê xisleta nîrxî dide dîrokê, hê jî di destnivîsên ewrûpiyan de çîhê xwe negirtiye. Lê, ev pêvajoyê nabe sedema

gorbihuştîbûna wî ciwamêrî. Her çîqas jî bo Toynbee rojava di nava reşariyê de korîşkî de be jî, çîhan di dawîya sedsala 20'an de li gorî rêbaz û destûrên rojava dizivire. Rojava, Zerdest jî bir kiribe jî, îbnî Xaldûn dizane. Pêdiviya Zerdest bi kurdan heye, ne ereb, ne kurd tîrk wî diparêzin. Bêguman kurdên oryantîtal î bi navîka 'reqqas'ê sond dixwînin. (Mîna, serdarekî ku xwe nivîskar bihesibîne û fermana şewitandina pirtûkan bide û bibêje li derdora min rewşên bir pir in.) Ev tê wê maneyê ku navê Mixo dike Rîxo...

Demsala navîn, demsala tîr organîze ye. Organîze, ji bo kurdan xeyal bû. Îro qonaxa jiyaneke rûmetî ye... Donkîşot û Panço... Hêvî ne... Bêguman civakeke bi rîkûpêk ûtopya ye. Ji ber ku civak, hûnandin û tevgerê giştî ya 'dijberî' ye. Lê, dijberiyê mîsyonerî û piştigiriya wiha digihêje qonaxa tîkîkî. Çîhana kurdî ziyana herî mezînan jî paşa dîtiye. Lê, du rengên paşayan hene. Cureyek jî wan, xwe ji gel didît, cureyê din xwe Xweda didît, komên xelkê ker didîtin. Paşazadeyên cureyî jî îro bûne gavan. Paşayê mîna Kor Huseyîn Paşa jî, li gorîstanê Dugîrê di kêleka mirovên mîna Haco, Hiseyîna Ferho, Dr. Nafîz, Eliyê Yunus de razayî ye. Gelo, gora paşazadeyên oryantîtal û arabesk wê li kîjan gorîstanê be? (Mîna hozanên ku di demjiyana destanan de bîjîn û di xewna xwe de bibe mirîşk û xwe di kuwarên garî û dexlê de bibîne.)

Xanzayedeyê napolî, ji ber nîqaşa 'Arîsto

jî Dantê mezintir e', pir caran duelloyê dike. Dawî birîndar dibe. Li ber mirinê jî dipirsin: 'Bi rastî, Arîsto jî Dantê mezintir e?' Xanzade bersivê dide: "Xwedê bela xwe bide her dûwan, min ne ji wî, ne ji yê din hevokê nexwendîye." Li ba me kurdan rewş ev e. Dilê ku di nava kufîkê, kefzê de gemaftî bûbe, xwîna reş zerkî nava mêjî dike, bîyî ku pirtûkan bixwînin, fermana jîholêrakirina wan didin. Ramangîriya hemdemî li rojava bi Machiawellî, li rojhilat bi Zerdest dest pê bike jî, ji sedema hêz û dewletî nîrx bûye yê îbnî Xaldûn û dibêjin, pê dest pê dike. Li Kurdîstanê hinek mirovan li ser navîka xwe dibirî û şax û perên xwe digihandin salên 1970' yî.

(Nivîskarekî ku dev ji nîrx û normên gelê kurdî berbide û kirasekî din li xwe dike, lê tir û qapana xwe li ser a kurdî dihesibîne.)

Oryantalîzma kurdî bi orînta Ewrûpî re berbûtiyê paşazade û keşezade ye. Hêviya paşerojan ku ev be, navê Mixo her dem wê bibe Rîxo...

Ambargo: Dijberiya Homo moralîs e. Di dema îro de bûye gotineke pêkarîne. Tu maf û dozê di nav hûnandinê xwe de ranagire. Dizî û çepeliyê bi xwe re tîne, yan jî qaçaxê... Çepelî nexweşî ye, gurîbûn gir e. Qaçaxî neçarî ye...

Gotîna dawî: Rewşên birî kirasê hişê xwe û zanîbûna xwe li xwe dike. Lê, kirasê ku bi meqes û pargala zanîstiya çîhanê bête xemilandin. Li derveyî vê xemla kirasa û xeftana malkambaxî ye.

Awirên dayikeke evîndara şoreşê û şehîdek

Îsmail



İsmail Kuyumcu, di sala 1994'an de li Amedê di bin çav de hate qetilkirin.

Di nav gotinên wê de ramîneke fireh û wateyek kûr hebû, digot: "Em pir xerab ketine, lomā rabûna me zehmet e. Divê berxwedaneke mezin û xurt bê dayîn. Qirêj û gemara li ser dilê me hew xwîn dikare bişo...."

çavên me hew xwîn dikare bişo...." Sohbeta me gelek dirêj domand, her kesî li gorî xwe fikrên xwe anîn zimên. Ew kesên li dora me hemû rabûn û dawiyê ez û ew tenê mabûn. Min tevayî wêrekiya xwe da serhev û bi dengêkî nîvlerzok bêyî ku li çavên wê binihêrim: "Dayê, nizamî çima ye? Xwîna min pir li te dikele." Ewî demê, hêdika destê xwe dirêjî ser destê min kir û bi bêdengî demekê li min

nihêrî. Min dema serê xwe bilind kir ku ez lê binihêrim, min dît ku di her du hinariyên wê yê soring de çend dilop hêstir berjêr diherikin. Ez bi biryar bûm. Gere wê, ew kula li nava dilê xwe îro birijanda. Ew tilsima ku li nav çavên wê de min ber bi xwe dikişîne, gere min îro nas bikira. Piştî hinek sohbetên taybet, dest pê kir û got: "Çar law û du keçên min hene. Kurê min ê mezin endazyar e. Yê hempiştê wî niha sosyolojiyê dixwîne û yê ji wan biçûktir jî li dibistana amadehiya beşa fenê dixwîne. Kurê minê biçûk û keçikên min jî niha li dibistana navîn dixwînin. Keça min a mezin jî dibistana amadehî kuta kiriye lê nexweşok e; waye li malê dinihêre. Mêrê min jî di saziyê dewletê de dixebitî, niha teqawit bûye. Lê, ez ji mêrê xwe xeyidim û min terka mala xwe kir. Ez niha li ba mala diya xwe dimînim. Bi rastî kesekî min di nava şoreşê de tune. Ji xwe mêrê min ne aligirê vê dozê ye û zarokê min ên law jî xistine bin bandora xwe. Lê belê, yê qîz hem bala wan li ser min e û hem jî dilê wan di fikra min de ye. Li aliyê din ez dikarim bi hêsanî bibêjim şehîdekî min jî heye. Bi rastî ne kurê min bû, lê belê li ber dilê min jî her şeş zarokên min jî şêrîntir bû."

Wê demê, ji paşla xwe wêneyek ku hingî bi xwe re gerandiye kevn kiriye û şikandiye, deranî û kûr kûr lê nihêrî. Careke din di wan çavên wê yê zeytûnî de hêstirên zelal berhev bûn û bi dilopên hebûrtir rûyê wê xêz kirin.

Nefesek kûr kişand û berda. Wêne dirêjî min kir. Û careke din dest bi axaftina xwe kir: "Navê wî İsmail bû. Cîranê me bû. Ez û diya wî hemsalî bûn û me gelek jî hev hez dikir. İsmail kurekî reng qemer-zerin bû. Di biçûkiya xwe de her tim li nav mala me bû. Wî ji diya xwe zêdetir ji min hez dikir û min jî ji zarokên xwe zêdetir jî wî hez dikir. Malbata wan xizan bû. İsmail, li pastaxaneyan dixebitî. Piştî ku çû leşkeriyê û hat ev car wî ji xwe re pastaxaneyek vekiribû. A di wê demê de li Amedê livbazî û bûyerên şoreşgerî destpêkiribûn. İsmail çî derdên wî hebûna hemû ji min re digotin. Gelek bi min ewle bû. Xuya bû ku, İsmail tekiliyê xwe bi têkoşinê re danibû. Jixwe min jî li ser rewşa gelê me û welatê me ta wê demê tiştek nizanibû. Lê belê, İsmail gelek tişt bi min dan fêmkirin. Paşê li taxa me kî hate girtin, navê İsmail dan. Her tim polîsan cerdî ser mala wan dikir. Rabû dikana xwe girt. Êdî nikaribû li mala xwe jî bimîne. Gelek caran, bi şev û rojan li mala me dima. Dema li mala me dima, bêyî min kesî pê nizanibû. Paşê nihêrî ku nikare li nav bajar bimîne. Xatirê xwe ji me xwest û da rê çû. Sê mehên wî qediyar, rojekê veşartî hat. İsmail xortekî gelek jêhatî bû. Li mala me me dima. Ne haya zarokên min û ne jî yê mêrê min jê çêbû. Ev cara paşin ku ku li mala me dima, piştî çendekî mêrê min pê hesiya. Wî jî bi rewşa İsmail dizanibû. Jixwe li karê dewletê dixebitî û qet jî vê dozê hez nedikir. Û gelek jî bê ehlaq bû. Di navbera min û mêrê min de li ser İsmail gengeşî derketin. Gelek ji min xeyidî û heta dixwest tiştên ne layiqî me, li me bar bike. Mêrê min bi hêrs ji mal derket û got: "Ez vegerim, gere wî... li mala xwe nebînim. Bila bi teq... ji vir here" İsmail bêçare bû û gelek bi ber xwe ketibû. Ji şerman li rûyê min nenihêrî û gelek bi ber min jî ketibû. Got: "Çi bibe bila bibe, ezê herim." Ji bo ku neyê naskirin, ez rabûm min qatek cilên kurê xwe li wî kir û qirewatek jî bi sitûyê wî ve girêda. Digot: "Ev cara yekem e ku ez qirewatekê girê didim."

Min çenteyek bişfre jî da dest wî. Dema me xatir ji hev xwest, hêstirên çavên min û wî tev de ketibûn nava hev û ji min re got: "Ger mêrê te li te tade kir, ezê werim te jî bibim. Hema tu ji me re nan çêbike bes e." Ez keniyam, wî bi henek got, lê min ji dil dixwest. Min ji hêcana, jê nepirsî ku ka diravên wî hene an na. Hîn jî ew hesret di dilê min de ye.

Heftetekê paşê polîs bi şev hatin mala wan û ji malbata wî re gotin: "Me İsmail xistîye bin çav ji bo lêpîrsînê, lê wî xwe ji avahiya emniyetê qata sisiyan avêtiye ji bo ku bireve û dema ketiye, miriye. Cenazeyê wî vaye me aniye. Gere îşev bêdeng bê veşartin."

Ez jî çûm ser cenazê İsmail, cendekê wî tev bi birin bû. Milekî wî û lingekî wî şikestibû. Li ser canê wî cixara hatibûn vemirandin. Diranên wî kişandibûn. Guhên wî qelaştibûn. Li ser tehdîta polîsan min û dê û bavê wî ew wê şevê veşart.

Lê, mirina İsmail bi rastî ne ew bûye. İsmail dema jî mala me derketiye, hin polîs ketine pey wî. Piştî ku çend hevalên xwe dîtine tevde çûne xeracekê ku herin cihekî. Yekî bê şeref ew îxbar kirine. Polîsan ew li wê girtine. İsmail ji nav destên wan xwestiye bireve, lê bi ser neketiye. Piştî ku ew anîne îşkenceyên xedar bi İsmail kirine. Li gorî gotinaq hevalên wî yê ku pê re hatine girtin, İsmail di bin wan îşkenceyên hov de yek peyv jî nedaye polîsan ta ku ew qetil kirine.

Min, ji pey mirina İsmail tam heftetekê tu xwarin nexwar. Lê paşê min fêmkir ku ev ne çare ye. A rast ew e ku ji bo tiştên İsmail dixwest çêbibe, ez bixebitim. Niha ez te dibînim a wer xwîna min li te dikele, lê ez naxwazim zêde dîna xwe bidim ser te. Xwedê neke ger tiştek bê serê te jî, ezê careke din malwêran bibim. Ez her tim lavahiyan dikim ji Xwedanê xwe re ku ez beriya mirina xwe wê roja pîroz bibînim. Armanca min bi tenê ev e."

□ 2 Berfanbar 1993:

Doz li DEP'ê hate vekirin

Dadgeha Qanûna Bingeîn a Tirkiyeyê doza girtinê li Partiya Demokrasiyê (DEP) vekir. Serokê Partiya Demokrasiyê Yaşar Kaya ji ber ku di sala 1993'yan an de çûbû başûrê Kurdistanê û li wir roja 18'ê gelawêjê di Parlamentoya Kurdistanê de axaftinek kiribû, ev axaftin bû sedema girtina Yaşar Kaya, pişt re jî ev axaftin kirin hincet ji bo vekirina doza girtina partiyê.

BÛYERINE JI DÎROKÊ**Özgür Ülke**

□ 4 Berfanbar 1994:

Özgür Ülke hate bombebarankirin

Rojnameya Özgür Ülke, li Stenbolê, navend û büroya wê ya Enqereyê, li ser daxwaza MGK'ê û bi fermana serokwezira wê demê Tansu Çiller hate bombebarankirin. Di vê bûyerê de Ersin Yıldız şehîd ket û gelek xebatkarên rojnameyê jî birîndar bûn. Ji bûyerê jî dihat fêhmkirin ku bi destê kesên profesyonel ev êriş pêk hatiyê. Lewre hemû bombe di heman demê de teqiyabûn. Wezirê karê hundirîn ji bo ku bersivekî dewletê veşêre îdîa kir ku rayedarên rojnameyê ev yek bi xwe kirine.

Konsera Baha Şêxo



Li gor ku tu pêşengiya vî gelî dikî ji aliyê zimên û huner de tu berxwedanek nedî, wê perdeyê neçirîne wê kî biçirîne, wê kî bi vî zimanî biaxive. Dijwar e! Piştî ku tu nizanibî ku mana wê stranê çi ye, tu yê çawa ji dil bibêje?

Roja 24'ê sernawezê li Navenda Çanda Mezopotamyayê birayê hozanê navdar Mihemed Şêxo, Baha Şêxo konserek da. Di konserê de beşdariya guhdaran xurt û geş bû. Baha Şêxo bi piranî stranên Mihemed Şêxo û yên Seîd Yûsif gotin.

Piştî konserê me bi hunermend Baha Şêxo re gotûbêjeke kurt li ser muzîk, rewşa welêt û hunermendên kurd kir.

Gotûbêja me li ser jînenîgariya wî dest pê kir. Baha Şêxo di sala 1962'yan de li gundê Xerçokê hatiye dinê. Xwendina xwe ya pêşîn li Xerçokê, ya navîn li Qamişlo kiriye. Piştî kutarkirina zanîngehê dest bi karê parêzeriyê dîke, lê ew di sala 1982'yan de dest bi karê mûzîkê dîke. Di sala 1989'an gava ku Mihemed Şêxo diçe ser dilovaniya xwe, ew jî dest ji karê parêzeriyê berdidê, bi temamî xwe dide karê mûzîkê. Baha Şêxo heta niha şeş kaset tomar kirine û niha jî amadehiya kaseteke nû dîke.

Ji ber ku cara yekemîn bû hatibû Bakur me rewşa vir û ya Başûrê Biçûk jê pirsî. Wekî hemû hunermendên me yên ji Başûrê Biçûk, pêşî li ser nepeyvîna bi kurdî rexne li bakurîyan girtin. Baha Şêxo ji bo ku kêr kes bi kurdî dipeyvîn tengezar bûye. Li aliyê din jî xebatên ku wî di sazîyên kurdan de dîtine, ew zêde kêfxweş kiriye. Hunermend Baha Şêxo li ser tîkiliyên kurdan jî wiha axivî: "Girêdaneke cografîk di navbera me de heyê. Ev jî dîke ku hêviyên me xurt bibin ji-bo ku bakurê Kurdistanê azad bibe û em jî pê re serbixwe û azad bibin."

Li gorî Baha Şêxo li Başûrê Biçûk rewşa zimên hîn baştir e. Gelê vî parçeyê welêt herdem

bi zimanê xwe dipeyîviye. Lê li Bakur hunermend û nivîskar jî bi hev re bi tirkî diaxivin. Şêxo wiha berdeham kir: "Ev tiştêkî ku mirov pir xemgîn dîke. Li gorî ku tu pêşengiya vî gelî dikî, ji aliyê zimên û huner de tu berxwedanek nekî, wê perdeyê neçirîni wê kî biçirîne, wê kî bi vî zimanî biaxive. Piştî ku tu nizanibî ku maneya wê stranê çi ye, tu yê çawa ji dil bibêji?"

Piştî re me got: "Gelo li Başûrê Biçûk bandora erebî li ser ziman û hunera kurdî jî ne wiha ye?" Baha Şêxo wiha bersiv da: "Her çi qas li Başûrê Biçûk ziman ketibû bin bandora erebî jî, rewş ne wekî Bakur e." Piştî re me xwest em li ser muzîka ku ew çêdike bisekinin. Şêxo pirsame ya wekî "Mihemed Şêxo muzîka klasîk çêkir. Ciwan Haco jî muzîka nûjen çêdike. Lê gelê kurd jî her du hunermendan jî pir hez dîke." Baha Şêxo pêşî jî bû ku Ciwan Haco gotiye, 'ez şagirtê M. Şêxo me' hurmeta xwe anî zimên. Piştî got ku ew li dijî muzîka ewrûpî ye; ji bo muzîka Ciwan Haco jî diyar kir ku ew hinekî ji girêdayî jiyana wî ya Ewrûpa ye. Şêxo wiha berdeham kir: "Hunermend dikare di muzîka xwe de amûrên ewrûpî bi kar bîne. Lê gava ku mirovek biyan muzîka li wî guhdarî kir, tê bigihêje ku ew muzîka kurdî ye."

Li gorî wî di muzîka Mihemed Cizrawî, Hesen Cizrawî, Kawis Axa de, guhartin di hundirê stranên van de tunebû. Lê muzîka Mihemed Şêxo jî her awayî ve taybetmendiyên klasîk li xwe bar nekirine. Şêxo wiha berdeham kir: "Pir li ser doza kurdî sekîni. Li kasetên wî gişan guhdarî bikin, hûnê rewşa gel û şoreşê tê de bibînin."

ŞEXMÛS ÖNAL

ÇAVDÊRÎ

Li Tirkiye û Ewrûpayê rewşa dibistan û mamosteyan



AMED TÎGRÎS

Wekî tê zanîn roja 24'ê meha 11'an wekî roja mamosteyan tê pîrozkirin. Li Ewrûpayê ev roj ne ew qas girîng e. Hikûmet û meqamên fermî wiha wekî li Tirkiyeyê bi derew û fortan ve roja han li mamosteyên xwe yê birçî û tazî pîroz nakin. Mamosteyên wan jî tu carî bi alên dewletên xwe demakevin kuçe û kolanan. Ji ber ku li Ewrûpa wiha zêde problemên mamosteyan ên aborî û civakî tunne, an jî gelekî kêr in. Hemû pêdivî û hewcedariyên mamosta, şagirt û dibistanan jî aliyê dewletê ve tên bicihanîn. Wekî mînak, li Swêdê heta sala 1994'an, dibistan bi wezaretê dibistanê ve girêdayî bûn û butçeyên wan ên serbixwe hebûn. Piştî 1994'an dibistan bi belediyan ve hatin girêdan û her belediye, ji bo dibistan û perwerdeyê butçeya xwe çêdike.

Li Swêdê dê û bav tu carî ji zarokên xwe re tiştên dibistanê yê wekî pirtûk, defter, pêncûs, jêbir û tiştên din nakirin. Hemû mesrefên zarokan ji aliyê dibistanê ve tên temînkirin. Wekî li Tirkiyeyê jî bo qeyd û alîkariyê jî dê û bav kronekê jî, ji dibistanê re alîkariyê nakin. Dê û bav bi tenê ji zarokên xwe re çente û cilûberg dikirin. Zarok her roj firavîna xwe li dibistanê dixwin û ji bo xwarinê jî pere nadin. Ev ne tenê ji bo dibistana seretayî wiha ye, ji bo lîseyê jî derbas dibe. Li Swêdê dibistana seretayî (ilokul) neh (9) sal in û lîse jî sê sal in. Yanî 12 sal dê û bav ji bo zarokên xwe kronekî jî mesref nakin.

Heger dibistan ji malê dîr be, wê demê heqê çûn û hatina otobûsan û metroyê di dibistan dide. Ji zarokan re kartên salane derdixin.

Ji bo xwendekarên zanîngehê jî, dewlet bê qeyd û şert krediyê dide her kesî. Hem jî di mehê de 100 milyon lirayê Tirkiyê.

Mamoste ji aliyê îdeolojîk û politîk ve azad in.

Ew dikarin di her komele, yekîti û partiyê de cih bigirin û aktîv bixebitin. Ji bo mamosteyan karekî duyemîn an jî sêyemîn ne qedexe ye. Ew çiqas zêde kar bike, ew qas jî zêde hac dide.

Ji derî Yewnanîstanê li Ewrûpa mamosteyên ku herî kêr meaş digirin yê Swêdê ne. Lê di şerî jî, li Swêdê mamosteyekê/nû mezûn dibe, bi kêmasî net 10 hezar kronî digire. Ev jî niha 150 milyon lirayê Tirk dîke. Mamosteyek dikare bi meaşêke xwe televizyon û sarkerek (buzdolabî) an jî bi meaşêke dikare televizyonek, seta muzîkê û vîdeoyekê bikire. Di şerî dikare bi meaşêke xwe yanî bi 10 hezar kronî otomobileke bikêrhatî bikire ku dikare 10 sal bi kar bîne.

Li gorî statîstîkên resmî di sala 1996'an de, bi kronên Swêdê * li welatên Ewrûpa meaşên mamosteyan wiha bûn:

Swîsre: 378031, Almanya: 278840, Îrlanda: 263709, Portekîz: 231608, DYA: 227742, Holland: 217070, Danîmarka: 21339, Belçîka: 215577, Fransa: 212420, Spanya: 207533, Avusturya: 196604, Îtalya: 178124, Finlandiya: 174997, Norwec: 167906, û Swêd: 157180


Çavkanî: Rojnameya Metro, 25.11.1997

*Kroneke Swêdê 25.000 lirayê Tirkiyeyê

Êrîşên li ser çanda kurdî, durûtiya dewletê ye



Navenda Çanda Mezopotamya (NÇM) di sala 1991'ê de ji bo ku rê li ber pişaftina çand û hunera kurdî bigire, hate damezirandin. Lê ji avakirina NÇM ê, heta îro pest û kotekiyên dewletê didomin. Êrîşên ku li ser NÇM'ê tene meşandin di mehên kewçêr û sermawezê de gurtir bûn. Di van mehên navborî de, NÇM'ya Rihayê ku bi çoşeke mezin hatibû vekirin, piştî dor-pêçkirineke demdirêj, bi biryara waliyê Rihayê hate girtin. Şaxa Mêrsînê hate dagirkirin, serokê şaxê Servet Özkan û endamê "Teatra Jiyana Nû" Kemal Ulusoy hatin girtin, şaxên Edenê û İzmirê 3-4 car hatin dagirkirin.



Abdurrahman Dilipak

Li aliyekî ev pest û kotekî didomin, li aliyê din jî Serkaniya Giştî ya Artêşa Tirk (Genel Kurmay Başkanlığı) hin rojnamevanan dibe Kurdistanê û li qada şer digêrîne. Ew jî qala çareseriyê "aborî, civakî û çandî" dikin. Li ser vê nakokî, an jî durûtiyê me xwest bîr û ramanên hin kesan bigirin. Di nav wan kesan de hin beşdarî ve gera navborî jî bûne, lê digel wan me dîtînen kesên welatparêz û demokrat jî girtin. Wan kesan pirsên me yê bi rengê;


"Dewlet li aliyekî dibêje ku, pîrsa kurdî di warê leşkerî de hatiye çareser-kirin, lewre jî divê, di warên civakî, çandî û aborî de xebat bêne kirin. Lê li aliyê din, pest û kotekiyên li ser çand û zimanê kurdî didomin. Bi taybetî jî êrîşên li ser Navenda Çanda Mezopotamya her ku diçin zêde dibin, hûn ve yekê çawa dinirxînin?" û

"Li gorî we li Tirkiyeyê sinorên saziyên çandî û hunerî û azadiya ramanan kî kîşî dîke angî divê kî kîşî bike?" bersivandin. Niha em bersivên wan kesan pêşkêşî dêhn û bala we dikin.

Prof. Mahir Kaynak (Şaewirmendê MÎT'ê yê berê):



Bedri Baykam



Mehmet Bayrak

■ Beriya her tiştî dibe ku ev bêkoordînasyonî be. Dewletê ji qadên bilind biryarek daye, ev yek diyar e. Lê dîsa dibe ku vê biryarê xwe negihandibe warên din. Ev nakokî ye. Wekî tê zanîn di demên borî de ji bo mafên çandî di nav leşkeran de bi piranî hewldan hebûn û daxuyanî hatibûn dayîn.

Îro li Tirkiyeyê diyar û berbiçav e ku sinorên çandê û dîtînan ramanan jî hêla MGK'ê ve tene destnîşankirin. Di vir de pîrsgirêk ev e ku siyaseta jî hêla siyaseta-vahan ve nayê afirandin û diyarkirin. Wekî minak, îro parastina rêxistinên çandî (ku NÇM jî di nav de ye) divê jî hêla dewletê ve bihata kirin. Lê tê dîtînan ku leşkeran dest avêtine vî karî jî. Di vir de jî nakokiyek derdikeve holê. Dibe ku leşker wiha jî dibêjin "Divê kesên sivil bi însiyatif bin." Mesele çawa wê çareser bibe? Ji mêj ve ez dibêjim ku bi bîpêkirina mafên çandî û nasnameya kurdî pîrsgirêk çareser nabin. Divê dewlet rîyeye din jî xwe re bîbîne. Lewre serbestberdana çalakiyên çandî û ramanî

Mahir Kaynak: Îro li Tirkiyeyê diyar û berbiçav e ku sinorên çandê û dîtînan ramanan jî hêla MGK'ê ve tene destnîşankirin. Di vir de pîrsgirêk ev e ku siyaseta jî hêla siyaseta-vahan ve nayê afirandin û diyarkirin.

dewletê tu car (li gorî baweriya min) naxê tengasiyê.

Abdurrahman Dilipak (Nivîskar- Akit):

■ Êrîşên li ser NÇM'ê niha ez ji we hîn dibim, heta niha agahiyên min der heqê ve yekê de tunebûn. Li gorî baweriya min rêxistinên sivil ên civakî divê neyên girtin. Kesên ku di van saziyan de sîc kiribin divê bêne darizandin. Lê ez ne girtina partiyan û ne jî girtina sazî û komeleyan rast dibînim. Biwêjek heye: "Ji bo kêçekê lihêfek nayê şewitandin." Ne ku mafên hiqûqî, lê belê xeletî û ne hiqûqiyên ku hepe divê bîne darizandin

û tawanbarkirin. Li gorî min sinorên raman û çandî çênabin. Lê ji bo qedexekirina saziyên çandî afirandina hincetên sîmî jî gelek xetere û xelet e.

Mehmet Bayrak (Lêkolîner û Nivîskar):

■ Ji destpêkê ve ez gera rojnamevanan di MED-TV û ATV'yê de temaşê dikim. Mesele ev e; ji damezirandina komara tirk heta îro dewletê armançek danîbû ber xwe ku heta pîrsa kurdî angî nasnameya kurdî jî holê rabe, divê têkoşîn bi kurdan re bê kirin. Ji wê rojê ta îro çareseriyê pîrsa kurdî spartine leşkeran. Ji ber van politikayên xelet û qirêjî, li Kurdistanê gelek serhildan pêk hatine, li hemberî ve yekê qirkirinên dewleta tirk çêbûne. Lê her gav dihat dîtînan ku pîrsgirêk bi vî rengî çareser nabe. Serhildana gelê kurd ku bi rêberiya PKK'ê dest pê kir, dûvajoya serhildanên berê bû. Lê êdî hêza leşkerî fêhm kir ku bi vî awayî çareserî nepêkan e, lewre jî êdî dixwaze ku kesên sivil çareseriyê pêk bînin. Ar-

têş jî ber ku bi cografyaya Kurdistanê û bi berxwedana gelê kurd re rû bi rû dibê, hin tiştan baş dibîne û dizane. Lewre jî dibêjin: "Armanca me têkoşîna bi terorîstan re ye ne bi terorê re ye, divê siyasî terorê çareser bikin." Di van waran de "Serkaniya Giştî a tirk" di rojên borî de mesajên xumam û baş ne diyar dide.

Meselaya rastînan "naskirina nasnavê gelê kurd" e. Îro ji her alî ve gelê kurd dibin pest, kotekî û êrîşan de dijî. "Şerêkî giştî li hemberî kurdan" tê meşandin. Ji bo naskirina nasnameya kurdan, şertê yekem dayîna mafên çandî ye. Ji aliye-



Karim Dilgören



Ferhat Tunç



Dîmenek ji îstekek eke Teatra Jiyana Nû



Seroka Gîrî ya NÇM'ê Nuray Şen

kî ve dewlet dibêje êdî emê rê li ber çand, huner û aboriyê vekin, aramî li herêmê pêk hatiye, divê çand û hunera kurdî bê sazîkirin. Lê li hêla din êrîşan dibe ser saziyên mîna NÇM ê û Kürt-Kavê. Ev parodoks û durûtiye.

Sinan Yerlikaya CHP:

■ Wekî partî, her gav em daxwaz û pêşniyaz dikin ku mafên çandî ên gelê kurd bîn dayîn. Bêguman tê dîtîn ku bi politikaya ku tê meşandin, çareserî dibe. Bi hezaran însan hatine kuştin, behîrî sê hezar gund hatine valakirin. Bivê-nevê ev yek bandora xwe di her warî de nîşan dide, di warê çandî û hunerî de jî nîşan dide. Lê divê dewlet di demê zûtirîn de ji kiryarên xwe yên ku gel, wekî sûcdarên potansiyel dibîne, di ber çav re derbas bike û biterikîne. Bi rastî jî çand xezîne ne. Her gelî çandê wî yê taybet heye. Ifadekirin û bi pêşxistina çand û hunera gelan gelek girîng e. Di vî warî de jî dewlet divê ev jî politikayên çewşîner berde û bêhtir politikayê nerm û parêzkar bide ber xwe. Bi rastî jî ez tê nagihijim çima ew qas dewlet jî çanda kurdan ditirse. Ji ber qedexekirina çandê gel serê xwe radike, pevçûn çêdibin lewre jî aramî li herêmê pêk nayê. Lê ji bo çareseriyê tu baweriyaya min bi hikûmetan tune ye.

Bedri Baykam (Hunermend û Endamê MYK'ya CHP'ê):

■ Bi giştî wekî hunermendekî hêviya min ew e ku, tu sazî û rêxistinên çandî divê nebin hedefên êrîşên dewletê. Li gorî agahiyên we, êrîş li ser gelek şaxên NÇM ê çêbûne. Lê wekî siyasemedarekî ez di telefonan de nikarin nirxandinan bikim. Li hêla din eger bi rastî jî êrîşên bi vî rengî hebin, ez gelek xelet û neheq dibînim. Ji îro şûn de jî, li gel van agahiyên ezê bêhtir di çapemeniyê de be, di warê siyaseta de be, ezê li ser van qedexeyan astengiyan rawestim.

Belê, rast e ez jî bi rojnamevanan re çûm herêmê, kes nikare bibêje ku li herêmê aramî pêk hatiye û herêm biyê mîna bihustê. Îro leşker bi xwe jî dibêjin ku li wir şer heye, em bixwe jî çûn

qada şer. Feqet ez ji bo egerên nijadî, daxwaza perçeyek ji welat bi xetere dibînim. Şerê ku diqewime jî ez bêwate dibînim. Îro li Tirkiyê yê sinorên çand, huner û azadiya ramanan zagonê kifş dike. Li tu cihê dinyayê azadiya bedawî tune ye, ne li Emetkayê û ne jî li Holandayê.

Koray Düzgören (Yeni Yüzyıl):

■ Ev yek nakokiyek normal e ji bo rêveber û birdeza Tirkiyeyê. Jixwe dema behsa pêşveçûnên çandî, civakî û civakî tê kirin, ev yek nayê maneya demokratbûnê, an jî mebest ne rakirina qedexeyan e. Tê dîtîn ku pirtûkên derbarê kurdan de hê jî tene qedexekirin. Pirtûka Tanik Ziya Ekinî berî ku derkeve hate qedexekirin. Di sa tê dîtîn dewlet li ber xebat û çalakîyên Navenda Çanda Mezopotamyayê û çalakîyên Instîtûta Kurdî (ku qasê serbest e) dibe asteng. Tistê berbiçav hem jî aliyê zagonî û hem jî jî aliyê fiilî ve asteng derdikevin pêşerî saziyên kurdan. Lewre jî di vir de nakokiyê mezîna tê dîtîn. Agahiyên min li ser qedexeyên êrîşên ku tenê ser NÇM'ê hene. Bi taybetî baya min ji girtina saxa Rihayê û girtina endam û rayedarên wê heye. Bi rastî îro li herêmê reş, kambax e, çawa ne kambax be? Zêdetir 2500 gund hatine valakirin, mirovên wan gundan kuçê û kolonên bajar û navçeyan dagirtine, di rewşa xizama û perîşaniyê de dijîn. Ez bi rojnamevanan re ku "Serkiyaya giştî" ew biribûn, neçûm herêmê, lê beriya wan ez li wir bûm. Hê jî bi sed hezaran însan

ne. Heger îro li navenda Şînexê her cure berhem bê firotan û bê dîtîn, ev nayê wê wateyê ku rewş li herêmê baş e. Ji herêmeke ku serobîna bûbe re mirov çawa bibêje rewş normal e.

Li gorî min divê di warê çand û hunerê gelan de tu kes sinora daneyze. Lê giraniya MGK'ê di vî warî de zêde kifş dibe. MGK bi taybetî piştî sala 1994'an hin bêhtir giraniya xwe danî ser nixên çandî û civakî. Di gelek waran de êrîş hene, di mîyatîfa rêveberên saziyan de ev êrîş hene. Xani mirov dikare bibêje "êrîşek tomerî (topyekûn saldir)" heye. Dema van êrîşan dîtîn, ji sinorê peywanî xwe derbas dibin û xalên zagonên xwe jî bînpê dikin. Di her warî de ev tîst xelet in, mezinbûna pîrsûrêke jî jixwe jî yekê derdikeve, sêweya dîtîn û ramanê li hemberî çand û hunerê kurdan jî serî heta bîni xelet e. Çareseriyê bîngêhî demokratîkîneke rastgîni ye. Divê herêmîbûn û mîsîyatîfa herêmî pêk were, dewleta navendî ku helên wê yên tarî gelek in, çeperên xwe bîşkêne. Çiqas qedexeyên zêde tenê êrîş zêde bin wê bêhtir ev sazî û rêxistin derkevin pêş û wê xurt bibin.

Ferhat Tunc (Hunermend):

■ Îro li herêmê şerê tînd heye. Ez êrîşên li ser saziyên kurdan jî wekî berdawama vî serî dibînim. Ji destpêkê he ta îro erîşên bi vî rengî li ser saziyên çanda kurdî zêde bûne. Di 4-5 salên dawî de bi saya Têkosîna Rizgariya Nete-weyî ya Kurdistanê, di gelek waran de, di warên çandî, siyasî û civakî de pêşke-

Ferhat Tunc: Di 4-5 salên dawî de bi saya Têkosîna Rizgariya Kurdistanê, di gelek waran de, di warên çandî, siyasî û civakî de pêşketinên xurt pêk hatine. Ev encam bêguman wê dewletê û serdestan aciz dike. Lewre bi her awayî êrîşan dibe ser kurdan.

birçî ne. Dibistan girî ne, perwerdehî tune. Rojnamevanên ku çûbûn herêmê hin ji wan dibêjin rewş baş e, PKK xelas bûye, herêmî bûye mîna bihustê. Ev ne rast e. Kesên ku wisa nabêjin û bi awayekî objektîf li bûyerê dinêrin jî he-

tinên xurt û bedew pêk hatine. Ev encam bêguman dewletê û serdestan aciz dike. Lewre bi her awayî êrîşan dibe ser kurdan. Ji ber ku dema bixwazê gelê kurd jî holê rake, divê di destpêkê de çanda gelê kurd tarûmar bike. Bi sed sa-

lan e ku gelê kurd bi vî rengî tarûmar nebû. Lewre jî bi tecrûbeyên salan gelê kurd kete dirûvekî nû. Gelê kurd baweriyaya xwe bi doza xwe yê mafdar û birûmet aniye. Di warê têgihîştina êrîşên dewletê de ez zehmetiyê nakîşim. Di vir de durûtiya dewletê jî derdikeve holê, li aliyekî behsa demokratîkîbûnê dike, lê li aliyê din çalakîyên çandî çiqas biçûk be jî, êrîş dibe ser wan. Dewlet di politikayên xwe de jî sextekar e. Li hêla din jî bo êrîşên li ser saziyên çandî, di serî de jî ez êrîşên li ser NÇM'ê şermêzar dikim.

Li Tirkiyeyê dewlet sinor û çarçoveyan jî bo dîtîn, raman, çand û hunerê datîne, hatiye merhaleyeke wisa ku êdî ev sinorên teng ketine mejiyên însanan, di mejiyên de dewlet dixwaze qereqolan ava bike. Diyar e ku bi hezaran girtî îro jî ber fikr û ramanên xwe di girtîgehan de ne. Kirinên dewletê ên bi vî rengî ez xwezahî dibînim. Ji ber ku dewlet jî rastiyan ditirse, sinorên bi vî rengî datine.

Nuray Şen (NÇM):

■ Êrîşên li ser me bi sistema tirk a kevneperest ve girêdahî ye. Ji destpêka damezirandina komara tirk heta îro, armanc; jîholêrakirina gelê kurd e. Hebûna kurdan tirs û xofê dixê dîl û mejiyê serdestan. Pêşketina tevgera kurd, dewleta tirk dîn û har dike, ev yek jî rîzandî û xitimandina sistemê bi xwe re tîne. Lewre jî, "Genelkurmay" a tirk rojnamegerên "Mehmetçik!" li Kurdistanê digerin. Ji aliyekî ve behsa demokratîkîbûnê tê kirin, ji aliyê din ve jî êrîşan dibin ser sazî û rêxistinên kurdan.

Çand û huner, kakilê rastiya gelan in. NÇM saziyêke alternatîf û muxalîf e. Dewlet jî îro bi xebatên ku NÇM diafirîne hesiyaye. Xebatên bi vî rengî siyaseta salane ên dewletê pûç û vala derîne. Ev yek jî NÇM'ê dike hedefa êrîşan. Îro rêz û hurmeta dewletê jî bo zagonên wan nemaye. Ji bo qirkirina kurdan zagonên xwe bînpê dikin. Heger zagonên wan, wan girê nedin, me qet girê nadin. NÇM wê bi zagonên gel bimeşe, ji ber vî yekê jî, di dawiyê de mirin jî hebe em amade ne. Ji bo me rastiya gelê kurd girîng e.

Şevbuhêrka wêjeya kurdî

Di şevbuhêrkê de li ser babetên "Medrese û wêjeya kurdî", "Dema Hawarê û Celadet Bedirxan", "Edebiyata sirgûnê ya kurdî", "Di cîhbûna zimên de rola rojnamegeriyê" û "Rewşa îroyîn a wêjeya kurdî" hate rawestîn.



Xwediyê Rojnameya Azadiya Welat, Celalettin Yöyler



Di wêne de Sami Tan û İ. S. Aydoğan tèn dîtin

Roja 22 sermawezê li şaxa NÇM'a Stenbolê duymîn "Şevbuhêrka Toreya Kurdî" hate saz kirin. Di şevbuhêrkê de li ser babetên "Medrese û wêjeya kurdî", "Dema Hawarê û Celadet Bedirxan", "Edebiyata sirgûnê ya kurdî", "Di cîhbûna zimên de rola rojnamegeriyê" û "Rewşa îroyîn a wêjeya kurdî" hate rawestîn. Her wiha di şevbuhêrkê de İbrahim Seydo Aydoğan du helbestên xwe pêşkêş kirin û endamên komên NÇM di navbera axaftinan de stran gotin.

Di şevbuhêrkê de axaftina yekemîn xwediyê rojnameya Azadiya Welat Celalettin Yöyler kir. Yöyler li ser rola medreseyan dîtinên xwe anîn zimên û medrese wekî zanîngehên Kurdistanê bi nav kir. Her wiha Yöyler li ser taybetmendiyên perwerdehiya medreseyan jî got ku, ji astronomiyê bigire heta wêjeyê di gelek warên zanistî de perwerdehî hebûye.

Celalettin Yöyler di dûmahîka axaftina xwe de qala Seîdê Kurdî û Şêx Seîd kir û bi wan mînakên di netewebûna kurdan de rola medreseyan anî rojevê. Yöyler di dawiyê axaftina xwe de bi giranî li ser Melayê Cizîrî rawestîya û çend rêz jî helbestên wî jî aliyê wateyê ve şirove kirin.

Di şevbuhêrkê de piştî Celalettin Yöyler jî Jiyana Rewşen Hamdullah Baki û Ji Azadiya Welat Salihê Ke-

virbirî derketin pêşberî beşdaran. Hamdullah Baki di axaftina xwe de li ser malbata Bedirxaniyan rawestîya û qala ekola Hawar û Ronahiyê kir.

Li aliyê din Salihê Kevirbirî, mijara "Edebiyata Sirgûnê" hilda dest û li ser sedemên sirgûnê û ekolên sirgûnê rawestîya.

Kevirbirî, di axaftina xwe de giranî da ser rewşa kurdên Sovyeta Berê û ekola Swêdê.

*Li Helepçê tu zarok neman,
û li Lice
hêvî mîna teniyekê mabû li
eniya mîn,
bajar di siya xwê de
dîhatin şewitandin; gund-ê
tîna xwe de;
ay nedîherikîn...
û şairan xwe dikuştin her
êvar,*

Sînorên psîkolojîk tîk diçin

Di şevbuhêrkê de Gerînendeyê Giştî yê Azadiya Welat Sami Tan, li ser rola rojnamegeriyê ya ji bo belavbûna zimên rawestîya. Tan bal kişand ser pelişîna sînorên psîkolojîk û daxuyand ku digel yekbûna siyasî ya beşên Kurdistanê her diçe yekîtiya neteweyî ya çand û hunerî jî xurt û geş dibe. Gerînendeyê Aza-

diya Welat wisa berdewam kir: "Ji pîrçeyên din nivîs ji me re tîna û rojnameya Azadiya Welat jî diçe parçeyên din ê Kurdistanê. Ev gelekî girîng e. Ji ber ku pêwîst e yekîtiya neteweyî pêşîn di mejîyan de pêk were."

Sami Tan çêli taybetmendiyên wêjeya nû ya kurdî kir û got ku perisîn û geşbûna wêjeya kurdî her dem li pey tîkçûna siyasî ye, lê ev cara yekemîn e ku wêjeya kurdî bi tev-

g e r a
aza-

*di terîqetan de jî
hêvî nedima...
me ev keser jî çavên doje-
hekê li bexçe xwe dinasî
me jî giriyên dayik û
dîlketiyên xwe.
me jî emrê xwe dinasî ev
xwesteka mirinê
û jî kurdûna xwe...
(İ. Seydo Aydoğan)*

diyê re li pey serkêta siyasî wêjeya kurdî bi pêş ketiye. Bi baweriyê Tan, edebiyata sirgûnê a kurdî jî êdî li xwe vedigere, lewre kurdên derketî jî dikevin bin bandora şoreşa Kurdistanê.

Herwiha Sami Tan, bi kurtasî li ser kevneşopîya Welat, Welatê Me û Azadiya Welat rawestîya û ew rûberî hev kirin. Tan got ku, armanca wan jî rekora rojnameya Welat borîne. Tan li ser pêşketina zimanê kurdî jî wisa axivî: "Berê ji bo ku

em nûçeyekê binivîsin em li peyvan digeriyan û me xwe baş îfade nedikir. Lê, îro em bi her awayî dikarin xwe bi kurdî îfade bikin."

Nivîskarên kurd divê bi kurdî binivîsin

Ji Kovara Jiyana Rewşen İbrahim Seydo Aydoğan jî li ser rewşa îroyîn a wêjeya kurdî dîtin û boçûnên xwe der birin. Aydoğan bi taybetî li ser girîngiya zimên rawestîya û got ku edebiyat li ser zimên tê afirandin. İbrahim Aydoğan rexne li nivîskarên kurd yên ku bi kurdî nanivîsin girtin û got ku hêviya wan ew e ku, ev nivîskar di demeke zûtirîn de li xwe vegerin. Aydoğan ev gotin li axaftina xwe kirin: "Yê ku zimanê kurdî biçêjîne (tam bike) hew dikare dev jê berde. Em her kesî dawetî ve yekê dikin."

Aydoğan behsa nîqaşên pîvanên helbesta kurdî jî kir û ev mînak da: "Niha ku helbestvanek li ser rewşa filîstîniyan helbesteke binivîse ew nabe helbestvanekî filîstîni." İ. Aydoğan wekî din bal kişand ser saz nebûna nivîskar û wêjenasên kurd got ku li gelek deverên cîhanê pirtûkên kurdî tîna weşandin, lê nivîskarên hay ji hev nîn e. Aydoğan her wiha li ser girîngiya rexnegiriyê sekinî û diyar kir ku di warê de wêjeya kurdî qels û lawaz maye.

MAZLUM DOĞAN

Li Navenda Çanda Mezopotamya Stenbolê

● 29.11.1997 Şemf: Şanoya Hêvî: "Gur", saet:14.00

Konsera Koma Dengê Azadî:17.30

● 30.11.1997 Yekşem: Şanoya Hêvî "Gur", saet:14.00

Yekîtîya Malbatên Mezopotamaya: çend mînak ji xwarinên kurdî

Konsera Koma Vengê Sodirî, saet: 17:30

Li NÇM'a şaxa İzmîrê

29.11.1997 Şemf: Konsera Koma Rojhilat, saet: 18:00

ÇALAKIYÊN HEFTEYÎ



Li BEKSAV'ê

● 29.11.1997 Şemf: Teatra zarokan: "Tom û Jerry"

Tiyatro İmge, derhêner û nivîskar: Filiz Işık, saet: 13.00

Film: "Bisikiletçi", derhêner: Tram Anh Hung, saet: 18.30

● 30.11.1997 Yekşem:

Konferans: "Riya Fikirinê"

Amadekar: Cengiz Gündoğdu, saet: 14.00

Konferans: "Bîrdoz û Dewlet", Alaattin Şener, saet:16.30

Film: "Viva Zapata", derhêner: Elia Kazan, saet:18.30

Qanûn jî li dijî jinan in

Di raporê de xaleke balkêş ev e ku, ligorî daxuyaniyên FBI'yê yên sala 1996'an serê pênc deqîqeyan li Amerîkayê li jinekê tecawîz dihate kirin.



Berî niha bi 37 salan li Domînkê di dema diktatoriya Trujilo de, di guherîna tevgera civakî de sê xwişk tîrê revandin. Pêşî tecawîzî wan dikin, piştî re jî dikujin. Piştî vê bûyerê jinên Karayipê yên Amerîkaya Latîn, paşê jî ji aliya jinên cihanê ve 25'ê sermawezê roja "Ji şideta li ser jinan re na" hate flankirin. Çawa ku li hemû cihanê li cihên cuda jin hatibe çewsandin bi qasî wê jî îro, li Kurdistanê jinên çewsandin. Lê jinên cihanê, jinên kurd û tirkê vê hefte wekî "Heftaya li dijî şideta li ser jinan, azadî û wekhevîyê" daxuyandin. Bi vî mebesta şermazarkirina zilma li ser jinan û xemsariya di vî warî de, li Egitim-Sena Batmanê, li Enqereyê Komîsyona Jinan a ÖDP'yê, li Stenbolê Komîsyona Jinan a DBP'ê û kovara jinên kurd Roza û li gelek cihên Tirkiye û Kurdistanê li ser jinan çalakiyên cur bi cur hatin lidarxistin.

Bi sedsalan e ku jin di şeran de tadeyên herî mezin dibînin, tîrê tecawîzkirin. Di bin çav de bi kirinê li derveyî mirovahiyê re rû bi rû dimînin. Li Ewrûpayê jinên li kolanan, li Rojhilata Navîn jinên di nav çepera feodalîzmê de, li Kurdistanê jî jinên kurd di nava şer de li girtîgehan, li kuçê û kolanan, li gund û li malên xwe tûşî destdirêjî û êrîşên kirêt dibin.

Her dem dawiya darizandina jinan di dadgehan de ji bo jinan bi encameke neyînî bi dawî dibe. Her wekî parêzer Mercan Polat jî di wî dibê. Her wekî parêzer Mercan Polat jî di wî dibê. Her wekî parêzer Mercan Polat jî di wî dibê. Her wekî parêzer Mercan Polat jî di wî dibê.

kirin. Heger neyê kirin jina ku tûşî kirinê kirêt maye, nikare xwe biparêze. Li gorî Polat, li Ewrûpayê rapora ku psikîyatrist bide, tê pejiirandin, lê mixabin li Tirkiyeyê ev rapor nayê pejiirandin. Polat her wiha got ku, cerdên ku li gundan pêk tîn û di bin çav de tecawîz û destdirêjîyên ku tîrê kirin pêwîst bibînin wê serî li dadgeha mafên mirovan a ewrûpayê bidin.

Li Tirkiye û cihanê mafên jinan

Li gorî lêkolînê Projeya Mafên Mirovan a Jinan di sala 1996'an de ji jinan %97 bi şideta re rû bi rû dimîne, %21'ê wan tîrê tehdîtî kirin, %15'ê wan tîrê hingavtin û bi xedarî birîndar dibin. Her wiha %21'ê wan rastî tecawîza mêrê xwe tîrê. Dîsa li gorî raporê li Tirkiyeyê di salekê de milyonek çarsed hezar jin lêdanê dixwin.


Di raporê de li ser rewşa jinên cihanê jî agahî tîrê dayîn. Li gorî van agahiyan li DYA'yê di salê de nêzikî 3-4 milyon jin jî mêrê xwe lêdanê dixwin. Her wiha di raporê de tê daxuyandin ku li cihanê di nav sedemên hevberdanê de, lêdana jinan sedema herî serêke ye. Dîsa li İngîlistanê jî heft jinan yek ji aliya mêrê xwe ve tê tacîz kirin.

Li gorî raporê li Rûsyayê piştî pelişîna sîstema sovyetê di pevçûna mêr û jinan de, %50'yê jinan jî aliya mêrê xwe ve tîrê kuştin. Di raporê de xaleke balkêş ev e ku, li gorî daxuyaniyên FBI'yê a di sala 1996'an serê pênc deqîqeyan li jinekê tecawîz dihate kirin.

AZAD ALTUN

TİŞK

Heqê dومانan



LERZAN JANDÎL

Naye ra 38 serî ravê ewro, yanê roja 20.11.1959 de beyannameya heqanê domanan amê eşkerakerdene. Na beyannameye de dewletan heqûqê domanan derheqê weşîye, cabiyene, wendene, perwerdekerdene, xeberiyene ûê. Ard bî re zon.

Se ke êno zanayene ebi cengê bindestanê tim deman berhermê serdestan bî motorê vumayena qomî. Ebi na vumayene qomî avê şî. Ebi nê avêşiyenanê qomî û sîvilîzasyonî mordemîyê zaf gamê girsî eşî. Sîniyfî, şarî, kesî, dîni, şenikiyfî, çenikî, grupê kaleke (dîşlanmîş gruplar), bêkarî, xeberkarî roj bi roj bî wayîrê heqanê neweyan. bê guman nê heqî hênî cawo hop hazir de nêyamê dayene. Mesela karkeran seba heqa grev û sendikaya ra zaf gonî rişnê, zaf berdelt dayî, xêlê amê kîştene, zafê dînan amê guretene. La belê pêyniye de karderan nê heqê xo kerdî xo dest. Heto bînan ra ebi guretana nê heqa û avêşiyena sîvilîzasyonî jî heqî amê guretene yan jî ebi vatenê de bîne amê şinasayene (dayene).

Heqê domanan jî pêyniya nê avêşiyenan de amê şinasayene. Bê guman şinasayena heqanê domanan nêna a manaye, ke problem, tengasî û derdê domanan qediyayî. Problemê domanan wunciya estê, la belê qilîf vurno ra. Ma vacîme qomêde kapîtalîst de problemê domanan nêweşîya domanan ra merdene niya. La belê naca jî problemê domanan estê û çareserkerdena dînan jî hênî rehet niya. Ma waştî, ke naca tenê problemanê domanan generel rêyna biyarîme re zon (ziwan) û nê probleman miyan de, qalê problemanê domananê kurdan jî bikerîme. Problemê domanan her çî ra ver "ceng" ê. Her çîqa ke sebebê cengan domanî niyê û domanî cengan de pêro nidane jî, cengan de domanî ênê kîştene, îşkence bînenê, bê ma û bê pî manene. Ê wêşan, teşan, warway manenê. Weşîye, cebiyene, wendene, wendene seba domanan ra benê bingeqeseyê bê manaye.

Ê didîne problemê domananê Tirkiye. Naca problemê domanan zê zerê cengî niyê: La belê domanî wunciya îşkence vînene, kuyene wenê, bê bon manenê, wêşaniyêde dideniye, oncenê, muameleya zaf xirabe-qereqolan de, gurtexanan de-vînenê. Angorê kulturê nê welatan domanî cê de hetê ma û pira; mekteban de hetê maliman ra; leşkeriye de hetê subayan ra ênê kuyene. Wunciya nê welatan de emegê domanan zaf erzantî û bêînsaf êno xebermayene. ûêb.

Ma problemê domananê ma, domananê kurdan çik ê?

Verê her çî domanê ma cengê qilîrînî de hetê koledaran ra ênê kîştene, îşkence vînene, wêşan teşan manenê, warway rû bê wer manenê, mecbûrê koçberiyê benê. Ma û piyê dînan ênê kîştene, îşkence vînene, ênê vîndenî kerdene. Bê mekteb, bê wendên û nivîsrayene manenê. Mecbûrê xebatê karanê xirabînan manenê, sîstemê parzayena weşîye ra bêpar manenê. Zerê qomê xo de zê yew mordemî nêne şinasayene û famkerdene. Eke çiyê bîbo vanê: "Tî domana fam nêkena." Qederê yew mordemî ra bêpar ê. Zerê çeyî de hetê pînan re, yanê ma û pî, bira û wayanê pînan ra, hetê mordeman ra, dewjîyan ra ênê kuyene. Tî vana qey şiddet leteyêde "qederê" dînan o. Rûmetê fikrê dînan, bawariya dînan, tersê dînan lewê plan de ya qe çîno, yan jî zaf qels o. İnstitutsiyonanê koledaran de -zê mekteban, leşkeriye, dadgehan de- domanî zê yew mordemî rûmet nêvînenê, ser de jî muamelaya xirabe vînenê. Ebi asimîlekerdene domanê kurdan kesitiya dînan ra ênê dîrîfîstene. Hetê psikolojî ra wayîrê qesa niyê. Ebi kilmîyê wayîrê qe çiyêde şexsî niyê.

Ma mordemî hemverê naye çî şîkîno bikero?

Angorê bawariya mi, çiyê girêdayîyê cengî yo, teyn ebi çareserkerdena problemê kurdan êno halkerdene. No jî ebi xebatê ma beno û tayê jî derg anceno. La belê gelê çî estê, ke ma ganî înan seraş bikerîme. Ganî domanê ma çê de mîrê kuyene. Mecbûr mebe ke zê ma ronîşê, ê ma rawursê, zê ma bîfikirê. Domanê ma ganî çeyê xo de her het ra zê yew mordemî (fînanî) bîrê şinasayene. Qedr û qîmet bîdero dînan, fikr û bawariya dînan. Ganî ma xo vîra mekerîme, domanî amayena ma nê. Amayena ma girêdayîyê domanê ma na. Xo vîr ra mekerê, domanî gul ê, domanî çiçeqê, domanî gunekê. Dînan ra hes bikerê!, pîro mederê!, qedr û qîmet bîderê dînan, kesitî û fikrê dînan!

Soz

Tav mîna qîzeke şox û şenga şermîna gundiyan; gav (carekê) dibijkurî, gav (carekê) jî bi tiliyên nazik û nerm û şil çoraka reşa tarî; bi dizî û hêdî hêdî bi ser rûmetê bişkiftî de dikişand.

Dema dibû êvar cotkaran dest ji kolana zeviyan ber dida. Şivanan pez ber bi kozik û kotanan ve diajotin. Jinên westiyayî bi barên giran ji kaniya gund dizivirîn. Her kesî lêz dida pêngavan. Deriyên malan hatin pêvedan û girtin. Her kes bi hêviya rojeke nû raket û gund bêdeng ma.

Ji nişka ve ger kete nav gundê nivistî. Her kes ber bi perestgehê ve diçû, rêz girtin û rûniştin. Dengê ciwaneke bejinzirav; ter û rûmetpak; çavgeş û lewendî pêçayî; bêdengiya perestgehê disimî û di serê gundiyan de diçeçî. Car bi car geş dibûn; carinan jî diqurmiçîn, an jî girij dibûn. Çiqas dem diborî; ew qas dengê ciwan zelaltir dibû; peyvên tamedek xweştir jê dibarî û hênik didan ber dilên biçûk û safên gundiyan.

Peyv mîna sulavên biharan; bi gur ji lêvên keçikê difirîn; geh bilind; tund û tûj sadeyî û sawilkiya gundiyan didirî; geh ne jî nek û şîrîn wekî layelayên dayikên dilşewat di şevên dirêj û bêaman ên zivistanan de. Stranên evîneke veşartî; dûr dâr; ne bi tenê ji bo zarokên di bêşikên de distirîn; belkî ji bo evîndareke efsaneyî; kela dilên şikestî; kul û kovanên bindestî û kolewariyê pê dirivandin. Ciwanê mîna awazjenekê behredar; car dibû gundî şa dikirin; carinan jî pest û xembar. Gav dibûn xwedî bihuşt; gavina jî melil û bar giran. Nedizanî jî xwe re bigirnişin an ku veciniqin û bi şûn de biçin an jî ji bo rewşa xwe ya perîşan bigirîn. Deng jî pêl bi pêl xurtir dibû. Ez deryayeke pir bi pêl im, kevnaran hildim; paşketinê laddim. Kevoka aşiyê me, şûrê Îmam Elî

me. Hêviyên gundî û bajariyan im. Çavkaniya ronahiyê me. Ez dizanim destpêk çiqas giran e; lê ev jî nehêniya jiyanê ye...

Dem ne hêviyên biçûk dirivandin; soza asoyeke ron; pêşerojeke geş li go-

tinan xwe dialandin. Dem ne ji zarokên serbirî; jinên dil û melûl û zelîl an jî kelepçeyên di destên egîd û mêrxasan de, di axaftinan de derbas dibûn. Wextê dest radiweşand, sehmeke giran digirt dilên gundiyan. Qeydên koletiyê kûr û dûr ber bi xwe ve dikişandin. Dem dihat, çavên wê geş dibûn; gundiyan xwe radiweşandin, tamedek çir xwe dikişand ser mejiyan. Ev çî deng bû perdeya nezaniyê dirand... Mêjiyê hişk û req herişand... Dinyaya teng dadirî û ev sinorên pîroz jî têk şikandin.

Dengê keçikê gav bi gav nevitir dibû; serên gundiyan ji ber çokan ve dikişyan. Soz be, dema ez zivirîm, ez dê ji bo zarokan jiyanê bikim xelat, ji bo jinan jî mirovahiyê, ji kalan re jî nijdarî û ji bo evîndaran jî xewnên şîrîn, dermanê dildariyê bikim diyarî. Soz be, ez dê her vegirim vî warî... Perestgehê san ket bêdengiyê.

Dema hişyar bûn, pirsên giran di serriyan de dizivirîn. Çav bi çavan diketin û bi hev re dipirsîn: "Xewn bû an jî rastî? Gelo ev çî deng bû em hingaftin. Ferîşte bû ji asman ber bi jêr difirî, an ku jî meçêtir?" Her çawa be, êdî wan zanibû ev ne mirovek bû ji vî erdî. Dîrokek ber bi jêr, werçerxaneke nû dest pê dikir. Jiyan di navbera çar dîwaran de êdî nema tê bendkirin. Li derveyî gundan jî, cihên gelek gelek mezin berfireh û cudatir tîn dîtin. Zevî bi tenê bi sewalan nayên cotkirin. Şev jî ne bi tene ji bo razanê hatiye dinyayê. Perestgeh jî êdî nema; ji bo olperstiyê bi tenê, an jî kevnepeştîyê ye. Bihayê vejîne jî pir giran e ger tu ji xwe re bikî armanc... Reng, roj, nêr, mê, dûr, nêzik, jiyan, mirin, şadî û şînî, êdî wateyêke din ji wan dihat girtin.

Dengê şîrqîneke pir bilind bajar hejand û şiloqand. Dûkel û dûman û toz, rengê asman guherand. Qêrînan erd lerizand. Awazên mirinê bizav ji cadan, kûçe û kolanan revand. Ji ezman jî deng veda, her kes li ber deriyên malan, çavziq, du lêv vekirî, ber bi rojhelat difirî.

DILÊR AKREYÎ



Jina Sibê

Jina ku sibê, wekî her car, ji xew ranebû bi dengê zengilokê katjimêrê, dît ku dereng maye û hîndî cihê xwe de teqlo beqlo dibû. Bi lez rabû û cilên xwe li xwe kirin û derket, bê ku karên sibê dikirî kuta bike, bê ku qehwa xwe vexwe û bêmak-yaj, ta diçe ku cigara xwe yekem jî di xwefidankê de veketî ji bîr kiribe.

Jina ku dereng mayî ji karê xwe, ramiya ku makyaja xwe an hinekî jê di wagona metroyê de kuta bike, wek dibîne gelek jin wiha dikin û tevî ku wê berê wiha nekire, lê niha ew têgihişt ku

çima wan wiha nekir li malên xwe.

Lê nikaribû daxwaza xwe pêk baniya, ji ber ku dît îskela li ber mala wê girtiye, nepirsî çima û bi lez çû îskeleke dinê nêzik û bi zor cihê di wagonêke tijî de ji xwe re dît, ji ber ku binegên xêza din jî ketibûnê.

Jina ku dereng gihiştî karê xwe, zû kete nav kar, roja din pir di cihê xwe de teqlo beqlo nebû, di dema ku dixwaze de ji xwe rabû, cilên xwe hilbijartin û hêdî hêdî li xwe kirin, qehwa xwe vexwar, bêhtirî cigarakê hilkişand, makyaja xwe kuta kir û derket ku rojnameya

xwe sibê bikire û di wagona metro ya ku ew ji îskeleya nêzik bir de cihêkî xweş ji xwe re dît.

Rûpelên rojnameya xwe di ser hev re qulubandin û di rûpelekê de, (di rûpeleke hundirî de) xwend ku mîrêkî biyan jî celaba wê bi xwe, çend katjimêran xêza metroyê sekinandibû û bizava bajêr li hev xistibû. Wî ev tişt li îskeleya nêzikî mala wê kiribû û wî gulek rakiribû wekî ku rojname dibêje di rîya yekî bûyer dibû re guleke sor û komek pel hiştibû li ser maseyê berî ku bizava meşvana bisekinîne û di pelan de hinek nameyên ku mîrê biyan tê de bi zimane xwe dibêje çima wiha kir, nameyên şandibûne ji dostên dûr, ji malbatê re, wekî ku rojname dibêje nameyên li ser yekîtiyê û girtîgehan û welatên dûr diaxivin û nameyêke dirêj ji keçekê re

(xuya ye ew ji celaba wî ye). Keçekê ku niha nûçeyê dixwîne, em nizanin bê xem, bi eşq, bi hêstir, li ser yê biyanî ku îskela wê ye nêzik girtibû, ji ber ku ew bûbû laşekî parçe parçe, di bin tekerên metroya lezok de, laşekî ku jê re demek divê ta ku parçeyên wî ye bi xwinê şuştî kom bibin, laşekî ku baş zanibû berî ku wiha bike, ew nikare bêje siba te bixêr ji jina ku nêzikî wî rûniştibû re, ji jina ku ji nişka ve derî di rûyê wî de girt, (wekî welat) jina ku ew bi xwe niha rojnameyê dixwîne.

Ji berhevoka "Çirokên nexweşiyê, çirokên dînbûnê" ya çiroknivîsê ereb

CEMÎL HETMIL

WERGER: BÊZAR KOBANÎ

NÛDEM

№ 24 1997

a Nûdem bi sergotara li ser sirgûnê derket

Di vê hejmeta Nûdemê de gelek gotar, çîrok û helbestan cih girtine. Her wiha romana Mehmet Uzun a bi navê "Ronî mîna evînê, tarî mîna mirinê" ev çend hejmar in beş bi beş di nava rûpelên kovarê de ji xwe re cih dibîne. Di vê hejmarê de beşa 5'an hatiye weşandin. Ev beş li ser tîkiliyên keç û xortekî "Welatê çiyar" ên li zanîngeha "Welatê mezin" tê rawestî.

Her wiha di hejmeta navborî ya Nûdemê de nivîseke ku balê dikişîne ser xwe jî, hevpeyvîna bi

Mehdî Zana re ye. Di vê hevpeyvînê de Mehdî Zana digel vegotina çîroka jiyana xwe, li ser gelek mijarên siyasî, wêjeyî û dîrokî bîr û ramanên xwe dibêje. Di hevpeyvînê de xaleke balkêş ev e ku, Mehdî Zana tevî ku pênc pirtûk nivîsîne jî, xwe wekî nivîskar nabîne, bi zêdetir xwe wekî siyasethedarekî kurd bi nav dixe. Xaleke din jî, helwesta wî ya li ser nivîsandina bi zimanê kurdî ye. Zana diyar dixe ku ew li girtîgehê çar salan qet bi tirkî nepeyiviye, lê niha ji bo ku mesajên xwe bigihîne kesên

tirk, ew pirtûkên xwe bi tirkî dinivîsîne.

Nivîseke din ku me divê em dixwazin li serê rawestî jî, nivîsa Rojan Hazim a bi navê "Kritîkerî û Etîk" e. Rojan Hazim di çend rûpelên destpêkê de li ser pîvanên rexnegirî, bi berfirehî radiweste; mînakên erênî û neyinî rêz dike, ji bo rexnegiriyê tiştên pêwîst nivîsîne. Her wiha jî cudatiya di navbera gazin, gilî, dev-avêtin, polemîk, krîtîkê (rexne) de rave dike. Dîsa li ser nexweşîya wekî subjektîvîzm û sedemên wê jî radiweste. Lê mixabin piştî ku nivîs diqede, îcar tîbîniyê gelek dirêj dest pê dike. Mirov tê derdixe ku armanca nivîskar bersivdayîna rexneyê ku li nivîseke wî hatiye girtine. Di vê "Not"ê de nivîskar gelek rêz û rêçikên ku wî bi xwe diyarkirine, bînpê dike, bi awayekî erîskar bersivê dide yê li hemberî xwe. Ev yek jî dide zanîn ku gotin û kirin gelekî dûr hev in.

Di vê hejmeta Nûdemê de Şerefxan Cizîr bi sernavê "Çima Stalinîzm!?" derî li gengeşiyê derengmayî vedike. Lewre gengeşîya li ser pîrsa Stalîn û stalinîzmê li nav gelên din berî niha bi salan qediyaye. Lê Şerefxan Cizîr niha li ser sedemên ku Stalîn û stalinîzm derxistine û sedemên ku ew di nav çepgirî kurd de navdar kirine, radiweste.

Her wekî piraniya xwendevanên kovarê dizanin, Cizîr di kovara Nûdem bi

piranî li ser mijarên felsefî, bi taybetî jî marksîzmê nivîsan dinivîsîne. Di hemû nivîsên wî de marksîstiya wî jî diyar e, di vê nivîsê de jî Şerefxan Cizîr dijberiya xwe beramberî stalinîzmê eşkere dike.

Ji bilî van nivîsan, Arjan Arî, Rojan Barnas, Zeynel Abidin, Xebat Arif bi helbestên xwe balê dikişînin. Divê bê gotin ku bi tenê helbestên Xebat Arif bi zaravayê soranî ne, hemû nivîsên din bi kurmancî ne. Her wiha gelek kesên ku bi awayekî rîkûpêk di kovarê de dinivîsînin, di vê hejmarê de jî bi gotarên lêkolînî û nivîsên wêjeyî cih girtine. Ji wan cudatir, sê kurteçîrokên Helîm Yûsiv balê dikişînin.


Di dawîya kovarê de danasîna gelek berhemên nûderketî hatiye kirin. Nema maze danasîna kovara Vate ku ji hêla Mahmûd Lewendî ve hatiye kirin, balkêş e. Dîsa danasîna berhevoka ku ji heşt hejmarên kovara Dicle-Firat pêk tê, şayanî behsê ye. Nivîskarê vê danasînê Mustafa Aladağ, digel vê yekê hinek bîranînen xwe yê li ser Edîp Karahan jî vegotine. Vê yekê nivîs xweşiktir û balkêştir kiriyê.

Di dawiyê de mirov dikare bibêje ku kêmbûna nivîsên bi soranî û nebûna nivîsên bi zaravayên din ên kurdî wekî kêmasiyekê balê dikişîne.

SAMÎ BERBANG

Nasname

OSMAN ÖZÇELİK



Ez çepgir im, ez liberal im, ez misilman im, ez japon im, ez şair im, ez bijîşk im, ez çermesor im, ez frankofan im, ez jin im, ez alîgirê Galatasaray-Spor im, ez xwendevanê rojnameya Welat im, ez xwendekarê zanîngehê me, ez endamê tariqeta "Ku Klux klan" im, ez însan im.

Her mirov dikare xwe bi awayekî bide nasîn. Ango her mirovekî xwedî nasnameyekê ye. Nasname; kîbûna mirovan e. Mirov hebûneke civakî ye û nîşan û taybetiyên wî/wê hene. Kesîtiya mirovan bi van nîşan û taybetiyan derdikeve holê. Kîbûn û nîşanên kesîtiyê hemû bi hev û din re dibin nasname.

Mirovên sosyal ê vê dema nûjen xwediyê gelek nasnameyan in. Tenê yek nasname nema dikare mirovan îfade bike. Mirov; bi neteweya xwe, bi ola xwe, bi cinsiyeta xwe, bi karê xwe, bi bîr û baweriyên xwe yê siyasî, bi alîgiriya taximê sporê, bi eşîra xwe û heta bi malbata xwe xwedî nasnameyan e.

Ne pêwîst e ku mirov tenê xwe bi nas-

nameyekê bide nasîn. Mesela, mirov ne tenê kurd e. Dibe ku mirov hem kurd be, hem jin be, hem hezkiriyê muzîka klasîk û Ewropayê be û hem jî liberal be. Mirov jî nasnameyên xwe dikare çendekan bide pêş, dikare jî nasnameyên xwe çendekan paşê biguhere.

Belê du nasnameyên mirovan hene ku hilbijartin û pejirandina wan ne di destê mirovan de ye. Xweza bê ku ji mirovan bipirse, serarast wê nasnameyê dide mirovan. Mirov dikare wê nasnameyê înkare bike. Belê mirov nikare xwe jê xelas bike. Nasnameya bîngehîn ya xwezayî ya "neteweyî" ye. Nasnameya malbatî û ya cografîk jî bi vê nasnameyê re ye. Ango ew dikevin nava hevûdu, bi hev û din re yek in. Hilbijartina dê û bav angî hilbijartina neteweyî ne di destê mirovan de ye. Nasnameya bîngehîn ya xwezayî ya din jî, cinsiyeta mirovan e. Mirov an nêr, an mê yan jî nêrems (çift cinsiyet) tê dinyayê. Hilbijartina nasnameya cinsiyetê jî ne di destê mirovan de ye.

Ji derveyî ev her du nasnameyan, nasnameyên mirovan giştîk paşê tene pejirandin. Bi xwezayî pejirandina nasnameyên din, di bin bandora şertên der û dorê de pêk tên. Ger ew şert bêne guhartin, mirov dikare nasnameya xwe jî biguhere. Em bêjin, çepgir dikare bibe liberal. Alîgirê Galatasaray Spor dikare paşê vê nasnameya xwe biguhere û bibe alîgirê Hewlêrspor. Mirovekî guhdarê muzîka arabesk, ku ji xwe re ev rewş kiribe nasname, dikare paşê vê nasnameya xwe biguhere û nasnameyê "hezkiriyê muzîka klasîk" bipejirîne.

Nasnameyek heye ku ji aliyê mirovan ve paşê tê pejirandin û mirov dikare wê nasnameya xwe biterikîne jî, ev nasname ne xwezayî be jî mîna xwezayî tê nasîn û di hêza nasnameya xwezayî de ye. Ev, nasnameya olî ye.

Nasnameya olî bi malbat û der û dorê şeklê xwe distîne, ne xwezayî ye. Mirovekî di bin bandora malbatê de bûbe îslamî, paşê dikare wê nasnameyê biguhere û bibe fileh an ateîst. Yan jî mirovekî ateîst dikare bibe fileh an îslamî. Wekî gelê kurd hemû berê yêzîdî bûn, îro pirtirên kurdan bûne misilman.

Bê çawa nasnameya mirovan heye, her wiha nasnameya komên mirovan jî heye. Her civat jî xwedî nasnameyekê ye. Di qimê navîn de civat û dewlet bi nasnameya olî dihat nasîn. Piştî şoreşa îndustriyê nasnameya neteweyî derket holê û împaratoriyan olî şûna xwe dan dewletên neteweyî. Şoreşa Lenîn ya kewçer û felsefeya marksîzmê xwest ji bo mirovan û ji bo civatê nasnameya "çînî" bike bîngehîn. Belê nemeşîya.

Îro ji bo dewletan nasnameya neteweyî di pêşîya her tiştî de ye. Nasnameya olî û ya aborî jî girîng e.

Ger mirov xwedî "nasnameya mirovî" be, divê dest neavêje nasnameya tu kesî. Kî ji xwe re kîjan nasnameyê dipejirîne û xwe pê îfade dike û pê şad dibe, bihêlin bila bi wê nasnameyê bijî. Çi kurd û çi tirk, çi îslamî û çi ateîst, çi alewî û çi sînî, çi nêr û çi nêrems...

Mirovê bizdiyayî

Li gundekî Kurdistanê mirovekî xwedî dijmin hebûye. Rojekê biryarê dide ku wî dijminê xwe bikuje. Gazî heval û hogirên xwe dike û ji wan re dibêje:

- Geli hevalan, min biryar daye ku ezê filan dijminê xwe bikujim. Lazim e hûn alikariyê bidin min.


Heval û hogirên wî dikin nakin, ew dev ji biryara xwe bernade. Ji bêgavî dibêjin emê alikariyê bidinê.

Şewra xwe dikin ka wê çawa dijmin bikujin. Di dawiyê de biryar didin ku tev bi hev re herin gundê ku dijmin lê ye. Êvarê ewê der û dorê gund bigirin, yê xwedî dijmin jî wê here nav gund ku dijminê xwe bikuje.

Dibê êvar, dikevin rê. Gava diçin nêzikê gund jê re dibêjin:

-Emê li vir bin, tu jî here nav gund, dijminê xwe bikuje û were vir, emê bi hev re herin.

Yê xwedî dijmin gule dide ber devê tivingê û berê xwe dide malla dijminê xwe. Gava nêzikî malle dibe bala xwe dide ku tu kes li



der û dorê nîn e. Diçe ber derî û li derî dide, ji hundirê malê de deng lê dikin ku bizanibin ka ew kî ye li ber derî. Ewê li ber derî gava deng dibihîze, nas dike ku ev dengê dijminê wî ye. Li benda derî vekirina dijminê xwe nasekine, devê tivingê dide derî, pênc-şes derban berdide û heta jê tê direve, diçe cem hevalên xwe.

Hevalê wî jê dipirsin:

- Gelo te dijminê xwe kuşt ana?

Ew jî bi awayekî ji xwe bawer wiha bersivê dide:

- Ê welehî dijminê min di hundurê malê de bû, min pênc-şes derb berdane, ger nehatibe kuştin jî, her bizdiyaye.

MEDYA FÎLÎZ HESIN

Xizir bo

Dêrsim di rojê jû kom gerilayê ARGK'ê şonê jû dewî. Embazî (hevalî) yenê nizdî dewî; jû embazê xo erşawênê dew ku rewşa dew biperso. Namê embazî Zinar o. Zinarî kayfa reydi serê xo girêdawo. Bîksî padê cê da û ena wa şono verê berî. Dano berî ceniya kê yî vana:

- Kam o?

Zinar vano:

- May ma, hewal, hewal...

Cenî yena berî akena. Senî ke berî akena, embazê Zinarî eno hewa vera xo vîna jû de tersane û vana.

- Xizir bo, Xizir bo, Xizir bo!... (Xizir bo, Dêrsim de wexto ke mêrdim jû çiyê ecêb vîno vano)

- Cenî senî ki enewa vana, embaz Zinar vano qey cê ra vana. Embaz Zinar jî vano.

- Dayê Xizir niyo, ez a, ez Zinar a, Zinar!

REFÎQ GÊLIC

Gur û Berxika narîn

Gur ku leqayî berxika narîn bû girêz bi devê wî ket û jê re got: "Ezê te bixwim." Berxika narîn li ber digere û jê hevî dike.

Dibêje: "Ez gune me. Ma çima, çi tadeya min li te bûye ku tuyê min bixwî?" Gur dibêje:

"Sala çûyî ez di vir re derbas bûm, te ji min re da xeberan (çêr). Ji bo vê yekê ezê te bixwim" Berxika narîn ji nişka ve şûh dibe. Bi eşqeke mezin ji gur re dibêje: "Ma sala çûyî ez tunebûm, ez berxa îsal im."

Gur dibêje: "Ku sala çûyî tu nebûyî, wê gavê birayê te bû. Ji bo ku birayê te ji min re dabû xeberan, xilasiya te ji destê min tune, ezê te bixwim."

SEYDO BAŞÇI

BI XELAT... XAÇEPIRSA BI XELAT (96) XAÇEPIRSA

Agil (Peyvaqêr)	S	Li binêr (Çavêr)	N	Orkî (Astirêkê dardêr)	A	Ardan	E	Agil (Peyvaqêr)	G	Heset
(S)	E	Y	I	D	R	I	Z	(A)	K	S
Naxwan	W	E	L	A	T	M	A	R	I	
Bed	X	A	K	S	E	L	A	U	D	
Îmîn (Tîpêk)	L	I	S	Ş	N	A	S	A		
Çavêr	T	I	N	H	Ş	I	R			
Jinan	J	I	N	Q	A	T				
7	A	E	M	A	R	E				
Navê mîrî (Peyvaqêr)	R	E	M	E	Z	R	N			
Dîsa	D	I	S	A	I	N	I			

Bersiva Xaçepirsa 94'an

Xaçepirsa me bi xelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin me, emê wan binirxînin û bi rîya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmarê me ya 96'an




Jêrenot:
Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî navnîşana xwe ji me re bişînin.

Pênc kesên ku xelata xaçepirsa hejmarê 94'an kasêta Koma Rojhilat "MEZRABOTAN ÎMEZ" qezenç kirine: Medeni Alpkaya/Amed, Rewşen Şahin/Elih, Sultan Ekici/Sultanbeyli, Şivan Yürük/Wan, Abdullah Kadirhan/Amed

Sersarî	Partiya Barzani Masiyek	Mezat	Cinavkeke	Ling	Îdeal
Rewşenbîr ek		Gihaneke k	Rengêk	Baneşane k	
Daytk		Mam		Oksijen	Tîpa şeşan
Sedsal		Kirêt	1	Çavdêr	Herimî
		Lê şidîyan		Dengdarê n 'şûn'	8
		Stranek		Parkîtek	
Hazîr			Fekîyek		
Vînî			Bî ber		
			Îstîqrar		
			Raman	2	
Pêxember ek					
Hîdrojen		Bî devkî 'erê'			
	Rêxistînek e îrlandî		7	Vexwarîna bîngêhîn	
	Kanê			Jan	
Str		Dudilî			
		Tîpa dawîn			
			6	Jan kîşandîn	5



Qizil



EHM!..
NIG! NABE..
EZ NAKWAZIM EV
POLIS MEHKEME
BIKIM..
YA HÜN?..

DOZGER JI DOZÊN LI SER POLÛSAN PAŞ VEDIKÛŞIN



WELAT

Rojnameya Hefteyî
(Haftalık Gazete)

Li ser navê
Zerya Basın ye
Yayincılık
San. Tic. Ltd. Şti.
(adına)
Xwedî (Sahibi)
CELALETTİN
YÖYLER

NAVNÎŞAN
Ayhan Işık Sk. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL
TEL-FAX:
(0 212) 251 90 13

Gerîndeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
SAMİ TAN

Berpîrsê Karên Nivîsaran
(Yazı İşleri Müdürü)
M. SALİH TAŞKESEN

Berpîrsê têkiliyên bi gel re
(Halkla ilişkiler müdürü)
METİN AKSOY

Berpîrsê Saziye
(Müessese Müdürü)
TAHİR ELDEMİR

ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık
A.Ş.
BELAVKIRIN
BİRYAY Dağıtım

NÜNERÎTİYÊN ME
(Temsilciliklerimiz)

Munchen:
(Nünerê Giştî ye
Ewropayê)

Mahmut Gergerli
49 871 67 08 15

Brüksel:
Medenî Ferho
32 532 721 12 03

Suriye:
Jana Seyda
Helim Yüsiiv

Berlin:
Silêman Şido
00 49 30 691 6495

Hannover:
Selim Biçük
49 572 18 13 60

Stockholm:
Robin Rewşen
46 87 51 05 64

Bonn:
Ahmet Baraçkılıç
49 228 66 62 49

Hollanda:
S. A. Fewzi
31 104 85 55 43

Dewleta çete û kiştoxan

Rasfî nê kerdên û viraştan ra jî, ayseno ke na dewlet, biya dewleta çeteyan û kiştoxan. Ek winî nêbiyayê çetey û kiştoxî jew jew nêvradîyayê. Ek winî nêbiyayê verê xeftiyayanê HADEP û NÇM nêgirotê, roşnîkarî, mebûsî û wendoxî zere nêçebiyayê..

Zek yeno zanayin Partiya Demokrasiya Şarî (HADEP) goreyê qanûnanê dewleta tirk niyawa ro û xeftiyayanê xo jî çöşmeyê nê qanûnî de ramêna. Bêguman jew HADEP wina niya, partiye ke goreyê qanûnanê dewleta tirk niyayê ro, pêro winayê û xeftiyayanê xo jî pêro çöşmeyê nê qanûnan de ramenê. Goreyê nê qanûnan jî, partî şenê şirê heme ca propagandaya partî bikrê, pêserameyin (kombiyayin), eşkerakerdin û zey nînan teyay bikrê û vîrazê.

Nê qandê hemû partiyanê legalan wina ye û nê viraştinî jî rast û demokratîk ê. Gerêk tim û tim jî wina bê, la belê iyê wina nêbenê. Taybetî jî serva Partiya Demokrasiya Şarî (HADEP). Dewleta tirkê hemû xeftiyayanê HADEP de vejyena ci ver û nêvardena HADEP xeftiyayanê xo rahat biramo. Endamanê ci gena binçim, çekena girotxane, kişena, işkence kena û zewbî.

Dewleta tirk nê kerdên û viraştinê xo, no hefte jî Sêrt (Siirt) de ramitî, 23'ê menga sermawez de Serokê Giştî ye HADEP Murat Bozlak, serdaranê bînanê piya şî Sêrt û wast banê partî de, sermayanê HADEP'a Sêrt û şarîstanê ke çöşmedê Sêrt de, inana pêsermayin virazo û xeftiyayanê peyinan sero vînaninê inan bigiro. La belê waliyê Sêrt qandê pêserameyinî nêvirastin, ci dest ra çiçi ame kerd û nêvarda pêserameyin virazyo.

Waliyê Sêrt rojê pêserameyinî rayê ke şiyê Sêrt, ê pêro day bi birnayin û nêvarda sermayanê partî şarîstanê bînan wija ra bêrê tewrdê pêserameyinî bê. Miyanê Sêrt û çöşmeyê banê partî, polîsana kerdo pir û nêviradawo kes bêro nêzdîdê banê partî (ancî jî nezdiyê hezar kes banê partîde amewo pê ser). Jew serokê giştîyê HADEP û



çend serdarî viraday Sêrt, ê jî tiyara wa şîbî. Bê nînan kes nêvardawo Sêrt miyan. Wexto ke serokê HADEP şiyê banê partî, wast ke endam û sermayeyê ke banê partî de ameyê pêser ci rê sipas bikro, polîsî jopana û qelasana resayê endaman û sermayanê HADEP; keylê kerdê dirbetinî û keylê jî girotê binçim.

Nê vardayan ser 26'ê meng de, cagonyê serokê giştîyê HADEP Osman Özçelîkî eşkera kerdin rişt rojnaman rê. Eşkerakerdin de vardayin protesto kerd o û wina vajyawo: "Nê kerdên û viraştinan ra ayseno ke waliyê Sêrt qanûnanê dewleta xo nêsilaseno, û goreyê qanûnan nêçebiyayê." Osman Özçelîko rast vano, na dewlet qe jew wext

qanûnanê xo nêsilasena. Ci rê senî rind bêro, winî kena. Serokomarê na dewlet nêbî verdê çend seran vat; jû fin qanûnî ihlal kerdina teva nêbeno. Ancî wezirê karê zeriye verinê na dewlet nêbi vat: "Ma hêzar operasyone miyanîkî (dizdanî) viraştî.

Rastî nê kerdên û viraştan ra jî, ayseno ke na dewlet, biya dewleta çete û kiştoxan. Ek winî nêbiyayê çetey û kiştoxî jew jew nêvradîyayê. Ek winî nêbiyayê wendoxanê demokratan rê vardayin nêbiyê. Ek winî nêbiyayê verê xeftiyayanê HADEP û NÇM nêgirotê, roşnîkarî, mebûsî û wendoxî zere nêçebiyayê.

MEMED DREWŞ

Serhildana Ebabekirê Nordizî

Ji ber zordarî û koçberiyê, ji ber zagonên komara tirk ên nû; û ji ber asîmlekirina zimanê kurdî, gelê Wanê jî ketibû tengasiyê mezin. Leşkeran êrîş dibirin ser gundan; ê ku nezanibûya bi tirkî xeber bide an lêdan dixwarin, an jî bi zorê koçberî bajarên Tirkîyeyê dikirin.

Wekî tê zanîn komara tirk berê jî wekî îro li hemberî gelê kurd siyaseta xwe yê nijadperest dimeşand û di her fersendê de jî ji bo redkirina hebûna gelê kurd kar dikir. Her wekî kuştin û qirkirinên li Dêrsim, Agirî û Qeyqeliyê (Ozalp 33 gule), li başûrê Wanê, li minteqa Nirdozê jî qirkirin û talan pêk dianîn. Lê mixabin ev bûyerên ku diqewimin, piraniya van an nedihatî nîvîsin, an jî pir hindik diketin nav rûpelên pirtûkên dîrokê. Dîsa pir mixabin hinek dîrokanan lêkolînên xwe teng girtine û bi tenê di arşivê komarê de çî hinc van dinivîsin û diweşinin. Bêguman arşivê komarê yekalî ne û mirov ronî nakin.

Ji ber yê sedemê jî, bi dîtina me divê lêkolîn bi piranî di nav gelên kurdî bûyeran de cih girtine bîne kirin. Lewre ev hovîti ji hîra gelê kurd neçûne û niha jî di nav mêjiyê rûsîyan de, di nav stanan de û di dil û mêjiyê dengbêjan de cihê xwe girtine. Dema ku di civatekê de xebardan li ser dîrokê çêdibin, yek bi yek ten gotin û ronî dibin. Ezê di vê kurtîvîsa xwe ya dîrokî de li ser Serhildana Ebabekirî û Lezgîna lavên şekir rawestim.

Ebabekir û Lezgîna kî ne?

Ebabekir û Lezgîna ji eşîra Giraviyan Lawê Şekir (Şêrê Sor) in. Ji ber mîrxasî û welatheziya Şekir, gel digotê Şêrê Sor (Kızıl Aslan). Şekir piştî caran şerê komarê kiribû û di 1920'an de ji aliyê leşkerên komarê ve li gundê wî hatibû kuştin. Piştî kuştina Şekir, kurê wî Ebabekir ji aliyê rûsîyan Ertoşîyan ve wekî serokê eşîrê hate hilbijartin. Ji ber ku Ebabekir mirovekî zana, bêtirs û pir welatparêz bû. Li gorî gotinên rûsîyan, ew pir caran diçû başûr û rojhilatê Kurdistanê bi Qazî Mihemed û Mistefa Barzanî re civîn çêdikirin. Jiyanê Ebabekir û Lezgîna tim bi şer û koçberîyan derbas bûbû.

Lezgîna 1928'an de ji aliyê komara tirk ve li Wanê tevî çend hevalên xwe hat gulebarankirin. Paşê, Ebabekir jî di 1932'yan de ji aliyê komarê ve li Girtî-

geha Îspartayê de bi derziyê jehrî hat kuştin. Bi zelalî dîroka ji dayikbûna wan (hatina cihanê) nayê zanîn.

Sedemên Serhildanê

Ji ber zordarî û koçberiya bi zorê, ji ber zagonên komara tirk ên nû; wekî zagona kum û kincan (kilik kiyafet) û ji ber asîmlekirina zimanê kurdî gelê Wanê jî ketibû tengasiyê mezin. Leşkeran êrîş dibirin ser gundan, ê ku nezanibûya bi tirkî xeber bida an jî yê ku kum li serî nebûya lêdan û îşkenceyên mezin diditin, an jî bi zorê koçberî bajarên Tirkîyeyê dikirin. Ji ber wê rewşê sala 1926'an di meha şermawezê de Ebabekir tevî rûsîyan Ertoşîyan civînek çêkir. Di civîna de biryara serhildanê dan. Ji bo şer çek kirin û xwarek komkirin. Komara tirk bi wê rewşa wan hesiyabû. Cehşik û xwefiroş dîsa destvala nemabûn û der barê serhildanê de agahî didane hêzên komara tirk. Sala 1927'an di meha gulanê de sed leşkerên girêdayî alayîya Wanê di bin serokatiya yuzbaşî Cevdet da êrîş birin gundê Ebabekir Pêwêdera. Ebabekir û şervan jî bi vê êrîşê hesiyabûn, nêzikî gund pêşîya leşkeran girtin û şerekî mezin di navbera her du hêzan de çêbû. Di wî şerî da 70 leşker û serleşker hatin kuştin, çekên leşkeran û topeke 105 mm. ketê destê şervanên kurd.

Piştî wê serkeftinê holeke mezin (Culemêrg, Elk (Beytulşebab), Nordiz) ketê bin destê şervanan. Komarê êdî nedikarî şer bidomîne, lê dîsa dest bi liştîk û taktîkê xwe yê her tim kiribû, dîsa bi arîkariya xayin û cehşikan belavok belav dikirin, soza azadî û bertilan didan şervanan. Ji ber koordinasyonê kêm û xelasbûna cebîlxane û xwarekê hinek şeryan ji refan qetiyên. Ji ber vê hindê jî, kontrola holê hindî diçû kêm dibû. Komarê sala 1927'an di meha pûşperê de bi nêzikî 2000 leşkeran êrîş bire ser şervanan. Dîsa şerekî hovanê meşand û nêzikî 100 kurd (jin, zarok) hatin kuştin, hinek jî dil ketin. Bi vî awayî serhildan jî şikest. Ebabekir û çend şervanan qesta Başûr kirin, lê hê negihîştibûn ser sînor, Lezgîna û çend hevalê wî hatin gir-



Bavê Ebabekir, Şekirê Nordizî (Ser)

tin. Ebabekir dikarî xwe xilas bike û rîya xwe guherand, çû rojhilatê Kurdistanê cem Simko. Lezgîna û hevalê wî Eliyê Şaqûlî*, Simayêlê Lêwînî, Şêxoyê Xawistî, Qadir û Ceverê dîn li girê geman li Wanê hatin gulebarankirin. Jina Ebabekir û kurekî wî yê şer salî ji aliyê leşkeran ve li gundekî Xoşewê hatin xeniqandin.

Ebabekir heya sala 1931'ê li rojhilatê Kurdistanê xwe parast. Dîsa komara tirk effûyê qaşo derxist û digot: "Yên ku revîne derve ku teslim bibin wê bêqeyd bîne efûkirin." Ebabekir di sala 1931'an de hat gundê xwe, lê piştî du mehan hate girtin. Komarê ew du şalan di Girtîgeha Îspartayê de girt. Piştî ku du şalan wî qediyên, ew berdan û hate mala xwe.

Dem a ku ew hat mala xwe pir nexweş bû, wî digot: "Derziya jehrî li stûyê min dane." Ebabekir 3 mehan şûn de çû ser dilovaniya xwe.

Têbînî:

*Ertoşî: Eşîreke mezin e û di nav xwe de jî dibin 12 bavik, hinek ji wan ev in: Şerefa, Ala, Xevdan, Mamxula, Jirka, Xelîla, Xawista, Teya.

*Eliyê Şaqûlî, Serokê eşîra Alan bû. Ev bavê Sadûn Seylan û Bapirê serekceş Evdirehman Seylan e.

Çavkanî:

Nayîfê Xawesorî

Temûrê Elbakî

Ewdiyê Dengbêj

Hîdîr Gökşit pirtûka Kürtler I. İsyân-Tenkil.

Weşana Alan, rûpel: 87